Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî Jimar :1350 11-Sibat-2026 www.ronahi.net/ku/

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/
rojnameyaronahi
@ronahikurdi55
nameronahi@gmail.com
Rojnameya Ronahî
+963 984 370 218

# Armanca Navenda Lêkolîn û Parastina Mafên Jinan: piştgiriya jinê ye

Aylîn Ehmed/ Qamişlo

**Navenda Lêkolîn û Parastina Mafên Jinan li ser bingeha piştgirî, bihêzkirin û alîkariya jinan ji bo bidestxistina mafê xwe, bi rêya amadekirina lêkolîn, rahênanên hişyarkirinê û belgekirina binpêkirinên ku li dijî jinan tên kirin, kar dike.**

Navenda Lêkolîn û Parastina Mafên Jinan li Sûriyeyê di sala 2020'an de hat damezrandin. Navend ji komek parêzvan û çalakvanên mafên jinan pêk tê. Navenda wê ya sereke li Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê, li bajarê Qamişlo ye. Armanca wê ew e ku piştgiriyê bide jinan ji hêla qanûnî ve û binpêkirinên berdewam ên li dijî wan belge bike.


Armanc parstina jinan e

Navenda Lêkolîn û Parastina Mafên Jinan gelek xebatan dide meşandin, ew bi riya komxebat û semînerên diyalogê, herwiha bi riya kampanyayên hişyariyê yên ku mijarên têkildarî zagonên Rêveberiya Xweser weke Zagona Malbatê, zagona Zarokan û hwd dihewîne, hewil dide jinan biparêze. Herwiha ew bi berdewamî van zagonan pêşkêşî jinan dikin. Mekanîzmaya karê navendê li ser amadekirina dosyayên belgekirinê ji bo jin, zarok û mêran e. Dosya dozên tundî, kuştin, tecawiz û revandinê li herêmên dagirkirî vedihewîne û hewl dide kiryarên li wir belge bike.

### Kar û xebatên Navenda Lêkolîn û Parastina Mafên Jinan

Navend komek ji hiqûqnas û çalakvanên jin ên berevaniya mafên jinan pêk tê, herwiha gelek navendê wê li hundir û derveyî Sûriyê hene lê navenda wê ya sereke li bajarê Qamişlo ye. Di heman demê de ev navend ji "desteya damezrîner, desteya îdarî, desteya giştî û li gorî hewcedariyên ofîsan" pêk tê. Ev navenda Lêkolîn û Parastina Mafên Jinan hem girêdayî Tevgera Civaka Demokratîk (TEV-DEM) ê ye. Ev navend gelek caran kurs û atolyeyan li dar dixe, ji bilî wê semînerên taybet ji bo jinan dide, herwiha di her dewrekê de, li ser fêrbûna mekanîzmaya karê rolên jinan, zehmetî û zehmetiyên di pêvajoya belgekirinê de, perwerdekirina qanûnî di navbera Qanûna Jinan di Rêveberiya Xweser de û yasayên rewşa kesayetî li welatên cîran ji ber aloziya Sûriyê, ewlehiya derûnî û taybetmendiyên kesayetiya bihêz di nav jinan de didin. Di derbarê navendê de rêvebera Navenda Lêkolîn û Parastina Mafê Jinan Şêrîn Colî ji Rojnameya me re axivî.

### 'Mebesta me ew e ku em di her alî de piştgiriyê bidin jinê'

Şêrîn diyar kir ku mebesta me ew e ku em di her alî de piştgiriyê bidin jinê û wiha got: "Ji xwe azadiya jinê tê wateya rakirina astengiyên civakîbûnê û rûbirûbûna qalibên ku tê de, herwiha wekheviya bi derfet, kar, perwerde û mafên medenî de. Em ji bo ku jin bihêz bibin, xwebaweriya xwe pêk bînin û jêhatî û şiyanên xwe pêş bixin da ku biryarên xwe bidin, em dixebitin. Di heman demê de gelek hewildanên me hene yek ji wan perwerdeya berdewam ya jinê û piştgiriya wan ji aliyê aborî ve, herwiha piştgiriya wan dikin ji bo pirojeyên wan yên biçûk. Navend di warê belgekirina binpêkirinan de pispor e û berdewame. Ji bo dema me ya pêş beşdarbûna me bi rêxistinên navneteweyî re heye û herwiha projeyek din jî ji bo dayîna atolyeyan li hemû herêmên Bakûr û Rojhilatê Sûriyê li ser biryar û peymanên li ser jinê hene."

## FERHENGA BIWÊJAN

### LI SER ZAROK Û DÊBAVAN Û TIŞTÊN DIMNIN HEV

**Bav lingek hilaniye, wî yek li şûnê daniye:**
- Pir bi ser bavê xwe ve diçe; di her tiştî de weke wî ye.

**Baviko ye:**
- Taybetiyên nebaş ji bavê xwe girtine.

**Bavo bi nefs e:**
- Bi heman wateyê.

**Çêlîkên qirikê gihîştin, nan li qirikê bû hesret:**
- Dema zarokên yekî mezin dibin lêbelê lê nabin xwedî hingê tê gotin.

**Eynî bavo ye:**
- Taybetiyên nebaş ji bavê xwe girtine.

**Her giya li koka xwe tê:**
- Her tişt, her kes dimîne koka xwe.

**Ma kurê kê ye:**
- Daye bi dêbavên xwe ve; dêbavên wî xirab in, ji lew ew jî xirab e.

**Mirîşk reş e, hêk spî ye:**
- Ne şer te ku her kes weke dêbavên xwe be.

**Şîrheram e:**
- Ji bo dêbavên xwe nebaş e.
- Malê heram dixwe, mirovekî nebaş e.

**Teşiya diya xwe daye ristin:**
- Daye bi diya xwe ve; ew jî weke diya xwe dike.

### LI SER QAYÎLBÛN Û QAYÎLNEBÛNÊ

**Çi ne çê para keçê:**
- Ka çi nebaş e didin me.

**Eger ji te re dirêj be, ji min re di erdê re dikişe:**
- Eger tu pê qayîl nabî, ez ji binî pê qayîl nabim.

**Ez diçim pêş dibêje bîj e, dimînim li paş dibêje gêj e:**
- Ez çawa dikim qebûl nake; bi tiştekî qayîl nabe.

**Êlê xwe li pîrê girt pîrê xwe li êlê negirt:**
- Yê bihêz ji ya xwe tê xwarê, yê lewaz ji ya xwe nayê xwarê.

**Heçî ne ji te re ji me re:**
- Tişta ku ti kes pê qayîl nebe wê didin me.

**Karê ne çê para keçê:**
- Dema tiştekî nebaş didin yekî wisa dibêje.


**Lêva xwe lê kir:**
- Qîma xwe pê neanî; neeciband; li gorî wî nebaş bû.

Ji Pirtûka Ferhenga Biwêjan Ya Diyar Bohtî

Bi kamîreya Narama Mihemed



Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî Jimar : 1350 11-Sibat-2026 www.ronahi.net/ku/ Nirx: 500 L.S



## Di deh salên dawiyê de heft milyon jin ji jinbûyînê hatine derxistin

Li gorî pêşbîniyên NY'yê di 10 salên dawî de 7 milyon jin li welatên cûda hetine sinetkirin. Nîşaneyên derûnî yên sinetkirinê dişibe destavêtinê, her çendî sinetkirina jinan xwedî dîrokeke dirêj jî be, berxwedana jinan ya li hemberî vê jî xwedî dîrokeke mezin û xurt e.**R-2**

# PEYMANA 29'ê ÇILEYÊ DIKEVE MERIYETÊ

Lihevkirina 29'ê Çileyê di navbera QSD'ê û hikumeta demkî ya Sûriyê de gav bi gav dikeve meriyetê, li ser erdê di gelek aliyan de hemahengî tê xuyakirin û di vê çarçoveyê de gelek civînên îdarî û girêdayî ewlehiyê pêkhatin. Herwiha çavlirê ye ku di siberojê de xalên peymanê yên mayî yek bi yek li ser erdê pêkwerin.**R-3**










## 'Kurd bi ruhê netewî ji bo Rojava kom bûn'



Hevserokatiya Ofîsa Têkiliyên Dîplomasî a PYD'ê Sema Begdaş diyar kir ku dema mijar dibe gelê Kurd hemû hêzên desthilatdar ên ku di koka xwe ya dîrokî de dijminên hev in dibin yek û êriş dikin...**R-4**

## Piştî çend salên hişkesaliyê careke din Çemê Xabûrê herikî



Piştî çend salan ji hişkesaliya Çemê Xabûrê, îsal ji ber zêdebûna barîna baranê asta avê di çem de bilind bûye û careke din av tê de bi rêjeya ku her çireyekê gihaşt 20 $m^3$ tê herkandin.**R-8**


## 'Di vê qonaxa hestiyar de pêwîst e em li kêleka şervanên xwe bin'



Rewşenbîrên kantona Cizîrê diyar kirin ku rêkeftina 29'ê Çile di encama berxwedana gel de çêbû û gotin, "Di vê qonaxa hestiyar de divê em li kêleka şervanên xwe bin. Divê şagirt bi zimanê Kurdî bixwînin û ev mafekî rewa ye. Pênûsa rewşenbîran çeka wan e, divê baş bi kar bînin."**R-9**

## Gelê Kobanê 23 roj in li benda rakirina dorpeçê ne

Ev 23 roj in Kobanê di bin dorpêçeke giran ya êrişên çeteyên hikumeta demkî û çeteyên dewleta Tirk de ne ku bi krîzeke mirovî re rû bir û ye...**R-5**



## 'Çima Kurd wekî Cihoyan nikarin kongrekê li dar bixin?'

Şîrovekarê siyasî Pîr Rustem diyar kir ku armanc ji êrişan ew bû ku Ehmed Elşeri xwe di çavê murûdê xwe de hêzdar bide nîşandan...**R-6**





**Jin li Tebqa, Reqa û Dêrazorê di çi rewşê de ne?**
Nehîr Pale R-2



**Pêvajoya Aştiyê û komploya li ser Rojava**
E.Pêjder Altan R-5



**Garantiya sereke xweparastina gel e!**
Dilyar Cizîrî R-6



**Yekîtiya Kurd serkeftinê misoger dike**
Ehmed Hesen R-7

# Di deh salên dawiyê de heft milyon jin ji jinbûyînê hatine derxistin

Li gorî pêşbîniyên NY'yê di 10 salên dawî de 7 milyon jin li welatên cûda hetine sinetkirin. Nîşaneyên derûnî yên sinetkirinê dişibe destavêtinê, her çendî sinetkirina jinan xwedî dîrokeke dirêj jî be, berxwedana jinan ya li hemberî vê jî xwedî dîrokeke mezin û xurt e.

**Stêrk Mihemed**



Tevî hewlên berdewam yên ji bo bi temamî rakirina sinetkirina jinan, her tim metirsiya dubare derketina holê heye, li gorî amarên dawî, her sal bi milyonan jin dibin qurbaniyên vê diyardeyê û her diçe zêde dibe. Li gorî pêşbîniyên NY'yê di 10 salên dawî de dibe hejmara jinên sinetkirî bigihêje 7 milyon kesî Roja 6'ê Sibatê ku ji aliyê Neteweyên Yekbûyî ve weke Roja Navneteweyî ya li dijî Sinetkirina Jinan hatiye ragihandin, diyardeyeke ku her sal bi milyonan jin dibin qurbanê vê diyardeyê û encamên wê qet bi dawî nabin.

Ji ber vê yekê sûcekî li dijî mirovahiyê tê dîtin ku ji bo jinên ku di encamê de seqet dibin û bi tundî tên cezakirin. Sinetkirina jin di sala 1989'an de ji aliyê Rêxistina Mafê Mirovan a Cîhanê ve hatiye qedexekirin. Li gorî peymana mafê mirovan a madeya 19 û 24'an qedexe ye zarokên keç werin sinetkirin.

### NY: Di salên bê de dibe rêjeya sinetkirina jinan bigihêje 7 milyonî

Meha borî li welatê Sîera Leone ya li Rojavayê Efrîqayê 3 keçên di temenên 12, 13 û 17 salî de ji ber sinetkirinê jiyana xwe ji dest dan. Neteweyên Yekbûyî ji ber ku sinetkirina jinan dibe sedema seqetbûnê weke kiryareke li dijî mirovahiyê îlan kir. Lê heta niha jî ev diyarde li Rojhilata Navîn, Efrîqa û hin deverên Asyayê wek kevneşopiyekê tê meşandin. Li gorî rapora herî dawî ya Fona Nifûsê ya Neteweyên Yekbûyî, di sala 2023'an de zêdetirî 4 milyon û 300 hezar jin û keç hatine sinetkirin ku ev rêje wê heta sala 2030'an wê gelek zêdetir bibe û heta 10 sal piştî wê jî dê bigihije 7 milyonan.

Di sala 2015'an de metirsiya sinetkirinê li ser 3 milyon û 800 hezar jin û keçan hebû, lê her sala hejmar zêde dibû ev metirsî hîn zêdetir dibe.

Her wiha li gorî bîlançoya Rêxistina Wadî Almanyayê ya ku kar û projeyên xwe li Herêma Kurdistanê pêktîne û ji bo ji holê rakirina diyardeya sinetkirina jinan kar dike, di sala 2022'yan ya li Başûrê Kurdistanê 213 buyerên sinetkirinê hatine tomarkirin. Ji van 147 bûyer li Ranya û 66 bûyer li Hewlêrê bûn ku kesên hatin sinetkirin di navbera temenê 0-18 salî de bûn. Di nava çend salên borî de rêjeya sinetkirinê li Başûrê Kurdistanê ber bi kêmbûnê ve diçe. Di sala 2022'yan de li Germiyan tu bûyera sinetkirinê nehate qeydkirin. Lê ya ku di nava rêxistinan de bûye sedema fikaran şêweyê veşartî yê vê çanda xirabe. Ji berê wê jî pêngavên xwe yên ji bo hişyarkirina jin û keçan li ser metirsiya vê kiryarê berdewam dikin.

sinetkirina jinan di Îranê de, ber bi kêmbûnê ve diçe, lê %50 ji keçkên li deverên parêzgeha Homozganê heya niha jî, pêka edetên berê tên sinetkirin, û herwisa ev mijara di hin deverên Îranê de, berdewam dike.

### Encama sinetê dikare bibe sedema mirina jinê

Ew fonksiyonên xwezayî yên laşê keç û jinan mudaxele dike. Sinetkirina jinan weke êşkenceyê, dibe sedema êş û azara giran. Encamên wê dikarin bibin sedema mirinê. Piraniya keçên ku ji mirinê difilitin divê di jiyana xwe ya mayî de şopên birînên fîzîkî û psîkolojîk tehmul bikin. Sedemên sinetkirina jinan ku mafê zarokên keç ên tenduristî, ewlekarî û ewlekariya bedenî binpê dike, ji herêmek bo herêmek din li gorî faktorên civakî û çandî yên di nav malbat û civakan de cuda dibe. Rêxistina Tenduristiya cîhanî û Neteweyên Yekbûyî sinetê wekî binpêkirinek lebatên genîtal ên jinan dibîne. Koka peyva sinetkirinê ji zimanê Erebî tê ku ev yek ji mêran derbasdar e lewre li gorî olê mêr tên sinetkirin, lê li hin herêman sinetkirina jinan jî heye, ev yek bi navê xefad tê kirin û ev danasîn bi taybetî ji bo sinetkirina jinan e.

Gelek jin ji ber vê kiryarê dema ku anîna zarokan an sinet dibin ji ber çûyîna xwîna zêde jiyana xwe ji dest dane. Êşên giran heya dawiya jiyanê berdewam dikin. Herwiha dibe sedema nexweşiyên AIDS û vîrûsa hepatît. Çareserkirina van nexweşiyan jî zehmete. Lewma di warê tenduristî de bi tu awayî nabe sinetkirina jinan pêkwere.

### Nîşaneyên derûnî yên sinetkirinê dişibe destavêtinê

Jinên sinetkirî û çalakvanên mafê jinan diparêzin ên li dijî sinetkirinê teqez dikin ku nîşaneyên derûnî yên sinetkirinê dişibe destavêtinê. Bandora wê ya li ser jinan ji kêliya destpêkê dema sinet dike, baweriya xwe bi derdor winda dike. Dema wê dibin ji bo emeliyet bikin, destpêkê baweriya xwe bi xwe û hezkirina xwe ya jiyanê winda dike. Her tim hestê kêmbûn û şerma ku ew jinek seqete yan jî nîv mêr e hîs dike. Jinên tên sinetkirin êşa vê tecrûbeyê heta dawiya jiyana xwe dikşîne û gelek ji wan li gel derbasbûna ewqas sal li ser bûyerê re ew dîmen ji ber çavê wan naçe. Li gorî qanûna hejmara 8 a sala 2011'an a parlamentoya Herêma Kurdistanê sinetkirina jinê qedexe ye, lê ev qanûn heya astekê tenê li ser kaxezê dimîne.

Li gorî vê qanûnê;

-Her kesê hewldana sinetkirina jinan bide, wê cezayê madî jêre were dayîn. Wê ceza ji mîlyonekê kêmtir nebe û ji 5 mîlyon dînarê Iraqî zêdetir nebe.

-Her kesê/a ku jinan sinet bike, yan jî beşdarî vî karî bibe, wê cezayê girtîgehê bigire. Cezayê girtîgehê wê ji 6 mehan kêmtir nebe û ji salekê zêdetir nebe. Yan jî wê di berdêla wê de pere bide. Ew jî wê ji 2 mîlyona kêmtir nebe û ji 5 mîlyon dînar zêdetir nebe.

-Kesên beşdarî sinetkirina bêdaxwaz bibin, wê werin cezakirin û cezayê wan yê girtîgehê ji salekê kêmtir nebe. Yan jî wê 5 ji mîlyona kêmtir nebe û ji 10 mîlyon dînar zêdetir nebe.

– Eger kesa/ê ku sinetkirina jinan bike, bijîşk, yan tendûristkar û personel be wê sê salan ji kar were dûrxistin.

Li gorî daneyên rêxistinên jinan û mafên mirovan di salên dawî de rêjeya sinetkirina jinan kêm bûye, lê hîn ev diyarde bi awayek veşartî berdewaw dike. Hîn li hinek deverên Herêma Kurdistanê û gundan didome.

Li gelek welatên Ewropayê tevî cezayên giran û pereyan jî bi sed hezaran jin û keç hatin sinetkirin û gefa sinetê li wan tê xwarin.

Tê texmînkirin ku li Fransayê derdora 40 heta 60 hezar jin û keç bûne qurbanê sinetkirinê. Li gorî hin lêkolînan ev hejmar di salên dawî de di navbera 120 hezar heta 320 hezarî de ye. Li Fransayê li kesên ku zarokên keç sinet dikin herî kêm 5 sal cezayê girtîgehê, eger zarok jiyana xwe ji dest bidin jî ji 20 heta 30 salî cezayê girtîgehê tê birîn.

Li Swîsreyê jî hejmara keç û zarokên ku hatine sinetkirin an jî gefa sinetkirinê li ser wan heye derdora 15 hezar kesî ye.

Li Swêdê jî ev hejmar derdora dehan hezar kesî ye. Li gorî lêkolîneke sala 2015'an li Swêdê hate kirin, hejmara jin û keçên hatin sinetkirin 38 hezar kes e.

Li Elmanyayê jî hate ragihandin ku heta sala 2018'an zêdeyî 65 hezar jin hatin sinetkirin.

### Sinetkirina jinan li Herêma Kurdistanê

Li gorî raporên salane yên saziyên hişyariyê û pêşxistina jinan û zarokan ya li Iraqê 'Edwî', sala 2025'an li herêma Kurdistanê 77 zarokên keç temenê wan kêmî 10 salî hatine sinetkirin. 74 zarokên keç li navçeya Ranya ser bi îdareya Raperîn û 3 jî li parêzgeha Hewlêrê hatine sinetkirin. Her çendî li gorî yasayê sinetkirina jinan qedexe be jî, lê ev dane rastiya dewamkirina vê kevneşopiyê bi vekirî radixe ber çavan.

Welatên ku herî zêde Rojhilata Navîn rêjeya sinetkirina jinan heye wihane; li Somalî ji sedî 98 keç û jinan tên sinetkirin, Gine ji sedî 97, li Malî ji sedî 89, li Misir ji sedî 87, li Sûdan ji sedî 87, li Erîtreya ji sedî 83 û Yemen ji sedî 19 û li Iraqê ji sedî 7.3 ye.

### Helwestên jinan ya li hemberî sinetkirina jinan

Her çendî sinetkirina jinan xwedî dîrokeke dirêj jî be, berxwedana jinan ya li hemberî vê jî xwedî dîrokeke mezin û xurt e. Saziyên civaka sivîl û navxwe bê navber di nava civakê de gihiştina rastiya vê mijarê û daneyên berbiçav tim li qadan di nava têkoşînê de ye. Sinetkirina jinan xeteriyeke mezin li ser pêşeroja jinan dike, ev jî ji hişmendiya zayendperest a mêr e ku jinê qebûl nake û dixwaze hestên wê tune bike û bike mêr. Hişmendiya mêr a paşverû ji beriya niha bi seda salan xwe didomîne, mixabin jî gelek malbet û di nava wan de dayîk dikevin nava van xefikan ku jinan sinetbikin û mudexeleyî zayend û fonksiyonên xwezayî yên laşê keç û jinan bibin. Hêjayî bêrxistinê ye ku di Ol de tu îsbat yan gotinek ji bo sinetkirina jinan nîn e û nehatiye gotin.

## Ji Pênûsa Jin

### Jin li Tebqa, Reqa û Dêra Zorê di çi rewşê de ne?

**Nehîr Pale**

Jin li Tebqa, Reqa û Dêra Zorê kêmtirî 4 salan bi destê çeteyên DAIŞ`ê gihîştibûn asta ne tenê hebûna wan hatibû tine kirin, DAIŞ ew perçiqandibûn, nefes li wan qutkiribû. Ji sala 2014`an heyanî 2017`an malbat ji bo keçên xwe ji çeteyên DAIŞ`ê biparêzin ji temenê 13 salî ew dizewicandin. Di bin navê ol de jin anîbûn rewşa ji ber ew jinin, nefret ji xwe bikin. Piştî çend roj li ser ketina HTŞ`ê ya wan herêman, jin heman hestan dijîn. Dibêjin: `HTŞ`ê DAIŞ e. Çekdarên HTŞ`ê bi heman rêbazên DAIŞ nêzî me dibin. Destûr nadin em karê xwe berdewam bikin û dema em çûn me daxwaz kir karê xwe berdewam bikin, îhanet li me kirin.`

Destpêka HTŞ`ê ket van herêman pey rêveber û xebatkarên sazî û meclisên jin ketin. Gef li wan xwarin ku xwe radestî wan bikin û eger neçin gel wan wê bi ser mala wan de bigrin û bi darê zorê wan bibin. Bi taybet jinên ku di YPJ`ê, Asayîş û Meclisa Kombûna Jin a Zenûbiya ciyê xwe girtine dixwar. Li wan herêman hemû rêbazên li ser jin didin meşandin, dixwazin bi rûmeta wan bileyîzin û îradeya wan bişkîn in. Bi taybet jinên ku di hêzên leşkerî û xebatên Zenûbiya de ciyê xwe girtine, hedef têne girtin.

Sala 2017`an piştî ew herêm ji çeteyên DAIŞ`ê hatin rizgar kirin û li ser sîstema Rêveberiya Xweser hatin birêxistin kirin, cara yekem bû ku jinên ereb destûr ji wan re dihat dayîn ku tevlî xebatên rêxistinî, siyasî, perwerdehî, rêveberî, leşkerî, dîplomasî û xizmetguzarî bibin. Êdî dikarîbûn bi riya saziyên xwe zexta li ser jinê tê kirin, lêpirsîn bikin û hesab bixwazin. Mala Jin li hemû kantonan vebû û bû stargeha jinan. Diyardeya tûndî, destdirêjî, zewaca bi temenê biçûk û pir zewacî êdî ketibûn rojeva civakê de û jin li hemberî wê dibûn xwedî helwest. Jin êdî li hemberî kiryarên li wê dihat kirin, nema bêdeng diman. Bi navê jin çalakî birêxistin dikirin, li Tebqa, Reqa û Dêra Zorê Akademî vekirbûn û jin perwerde dikirin. Jinên ku civakê rê nedida hebûna wan, di nava Rêveberiya Xweser de gihîştin asta ku li Akademiyan perwerde bidin û pêşengtî bikin.

Di navbera çend salan de jin li Tebqa, Reqa û Dêra Zorê li hemberî zayendperestiyê dest bi têkoşînê kirin. Şikandina qeydên ol û adetan, ji bo jinan şoreş bû û jina ereb bi wêrek li ser van qeydan de çû.

Niha HTŞ`ê hewl dide şoraşa jina ereb destpêkirî biçewisîn e. Ji ber vê yekê jinên Dêra Zor, Reqa û Tebqayê yên di saziyên xweser de dixebitîn wê baskê wan bişkîn in. Îxanet li wan kirin û gef li wan xwarin rêbazên destpêke ne ku didin bikar anîn. Piştre jî wê destûr nedin ku ev jin ciyê xwe di saziyan de bigrin û wê wan li malê bifetisîn in. Jinên li hemberî zayendperestiyê destbi têkoşînê kiribûn, wê dawî li hebûna wan bîn in.



# Têgihiştin ji bo berdewamkirina danûstendinên Emerîka-Îran ê

Roja Înê, Tehrenê li ser gihaştina lihevkirinekê ji bo berdewamkirina danûstendinan bi Washingtonê raghand, piştî bidawîbûna gera yekemîn ku li Omanê hat li dar xistin, bi atmosfereke erênî ji hêla Wezîrê Derve yê Îranê hat wesifandin.

**Navenda Nûçeyan**

Di çarçoveya gefên serokê Emerîkayê Donld Trump bi pêkanîn operasyonke leşkerî li dijî Komara Îslamî ya Îranê, Tehrenê li ser gihaştina lihevkirinekê ji bo berdewamkirina danûstendinan bi Washingtonê re roja Înê raghand. Gera yekemîn a dansûtendinên di navbera Îranê û Emerîkayê de li Mesqetê paytexta Omanê hat li dar xistin, Wezîrê Derve yê Îranê Ebas Îraqcî bi erênî ev ger nirxand û wiha anî ziman: "Me nêrîn parve kirin û me li ser domandina muzakereyan li hev kir."

Di dema ku her du alî amadebûna xwe nîşan didin ji bo derfetekê din bidin dîplomasiya ku nakokiya Nûkleerî ya demdirêj di navbera Tehran û Rojavayî de çêbûye, bên çareserkirin, Wezîrê Derve yê Emerîkayê Marco Rubio got ku Washington dixwaze di danûstandinan de mijarên bernameya nûkleerî, bernameya mûşekên balîstîk, piştgiriya Îranê ji bo komên çekdar ên li herêm jî hebe.



### Dosyaya Nûklerî tenê di nîqaşê de ye

Berpirsyarên Îranî bi berdewamî ragihandine ku ew ê li ser bernameya mûşekî ya Îranê, ku yek ji mezintirîn bernameyan li herêmê ye, nîqaş nekin. Berê jî gotibûn ku Tehran dixwaze mafê wê yê dewlemendkirina Uranyûmê were naskirin. Ji bo Washingtonê, girtina tedbîrên proseya dewlemendkirina Uranyûmê di hundirê Îran de rêya muhtemel e ji bo çêkirina çekên nûkleerî ku wekî xeteke sor temsîl dike. Tehran ev demek dirêj e ku niyeta xwe ya bikaranîna sotemeniya nûkleerî wekî çek red dike.



Wezîrê Derve yê Îranê Ebas Eraqçî ji televîzyona Îranê ya fermî re raghandibû ku ev destpêke nû ye ji bo danûstendinan. Herwiha lihevkirinek ji bo berdewamkirina van danûstendinan heye û wiha gotiye: "Dê hemahengiya ku çawa gavên din bên avêtin wê bê diyarkirin, eger ev danûstendin berdewam bike, ez bawerim ku em ê ji bo têgihîştinê bigihêjin çarçoveyek baş."

Eraqçî destnîşan kir ku girîngiya dan û standinan li ser dosyaya nukleerî bû û got Îran dê tu dosyayên din li gel amerîkiyan nîqaş neke. Lê Washington israr dike ku divê bernameya mûşekên balîstîk ên Îranê û piştgiriya Tehranê ji bo komên çekdar ên li herêmê werin nîqaşkirin.

### Fikara Îranê ji amadebûnên Emerîk yên leşkerî

Wezîrê Derve yê Omanê Bedr bin Hemed el-Busaidî diyar kir ku danûstendinên di navbera Îran û Washngtonê de cidî bûn, heriwha encamên wê dê li Tehran û Washingtonê bi baldarî werin lêkolînkirin û wiha lê zêde kir: "Hîn jî pêşengtiya olî li Tehranê bi fikare li ser îhtîmala ku serokê Emerîkayê gefên xwe ji bo destpêkirina êrişan pêk bîne."

Di meha Hezîranê de, Dewletên Yekbûyî yên Emerîkayê di çarçoveya qonaxa dawî ya hemleya bombebarana Îsraîlê ya 12 rojan de, hedefên nukleerî yên Îranê bombebaran kirin. Ji wê demê ve, Tehran dibêje ku çalakiyên wê yên dewlemendkirina Uranyûmê rawestiyane. Komkirina hêzên deryayî yên Emerîkayê, ku Trump wekî "filoyeke mezin"bi nav kir, piştî zordariya xwînî ya ku hikûmeta Îranê li ser xwepêşandanan pêk anî ku li seranserî dewletê meha borî belav bibû, ku ev yek rageşiya di navbera Washington û Tehranê de hîn zêde kir.

Trump hişyarî da ku eger rêkeftinek neyê kirin dibe ku tiştên xirab biqewimin, bi vî awayî zext li ser Komara Îslamî ya Îranê zêde dibe. Hêzên cîhanî û welatên herêmê jî ditirsin ku danûstendin têk biçe, dê ev yek bibe sedema pêçûnekê di navbera Dewletên Yekbûyî û Îranê de. Herwiha bandorên wê dikarin li seranserî herêmên din yên dewlemend bi petrolê bike.

Di heman demê de Îran daxwaza rakirina cezayên ku di sala 2018'an de ji nû ve hatibû sepandin, dema ku Trump ji peymana nukleerî ya Îranê ya 2015'an vekişiya, ku Tehran bi şeş hêzên cîhanê re îmze kiribû, dike. Dewletên Yekbûyî yên Emerîkayê, hevalbendên wê yên Ewropî û Îsraîl Tehranê tawanbar dikin ku bernameya xwe ya nukleerî wekî perdeyeke ji bo hewildanên pêşxistina çekên nukleerî bikar tîne. Îran îdia dike ku bernameya wê ya nukleerî bi tevahî aştiyane ye. Îsraîl jî gefên ji ber mûşekên Îranê wekî gefên bernameya xwe ya nukleerî dibîne.

# Têkçûna Kurdan tê wateya mayîna DAIŞ'ê

**Navenda Nûçeyan**

**Parlamentera Parlamentoya Ewropayê Assita Kanko diyar kir ku kurd tenê hatine hiştin û wiha hişyarî da: "Têkçûna kurdan tê wateya mayîna DAIŞ'ê. Man û nemana kurdan ezmûna biryardariya me ye."**

Endama Tevgera Flaman a Nû (N-VA) ya Belçîkayê Assita Kanko destnîşan kir ku rasterast li Bakur û Rojhilatê Sûriyê kurd dibin hedef û divê Ewropa helwesteke zelal û biryardar nîşan bide û got: "Îro Kurdên li Sûriyê bi tenê ne, ji aliyê me ve hatine terkirin. Bi salan kurd di refên herî pêş de li dijê DAIŞ'ê şerkirin e. Bi hezaran can dan ji bo azadiya me, parastina ewlehiya me ya hevpar li Ewropa û dervî wê, ne tenê ji bo civaka xwe.

### Destkeftiyên Kurdan di bin xeteriyê de ne

Assita Kanko bal kişand ku kurd li dijî cîhadîstên ku jinan dikin kole, êzîdiyên ku bi zindî dişewitandin û bi serjêkirinê hêzê digrin, hevalbendên me bûn wiha got: "Ew hevalbendên me bûn li dijî terorîstên ku jinan dikin kole, êzidiyan zindî dişewitînin û ji bo li hin herêmên Sûriyê hêzê bi dest bixin seran jê dikin. Gelo em ewqas sist bûne ku em çavên xwe ji tunekirina hevalbendên xwe re bigirin? Wan ji bo me şer kir; di nav wan de jinên ku dîsa ji bo me di refên herî pêş de bûn jî hebûn."

Assita Kanko diyar kir ku destkeftiyên kurdan li Bakur û Rojhilatê Sûriyê di bin xeteriyeke mezin de ne û got ku pêşveçûna hikûmeta veguhêz, destdanîna ser axê û nêzîkatiyên ku belavkirina xweseriya kurdan dikin hedef û aramiya heyî dixe xeteriyê. Herwiha anî ziman ku dîmenên hefteyên dawî derketine holê û gihiştine cîhanê bandoreke mezin çêkirine û axivî: "Bombebarankirina bêserûber a taxên kurdan, kolekirina jinan, înfazkirina dîlên şer û vekirina girtîgehên ku cîhadîst tê de ne, divê mijarên sereke bin ku em bala li ser rawestin."

### 'Tevî agirbestan jî li derdora Kobanê binpêkirin berdewam dikin'

Assita Kanko destnîşan kir ku ev geşedan ji bo Ewropayê jî gefeke rasterast e û got: "Dibe ku ev terorîst rojekê li deriyê me bixin. Beriya du hefteyan li ber dergeha Reqayê ala DAIŞ'ê hildan, hişyariyeke tirsnok bû ku divê em rabin ser piyan û bikevin nav



tevgerê. Tevî agirbestan jî li derdora Kobanê binpêkirin berdewam dikin, modêla rêveberiya berfireh a li ser bingeha mafên jinan û parastina kêmneteweyan bi xetereya tunebûnê re rû bi rû ye."

Assita Kanko bi rengekî vekirî hişyarî kir û bang li Ewropayê kir û wiha got: "Em nikarin kesên ku li dijî dijminên me yên hevpar şer dikin bi tenê bihêlin. Divê Ewropa bi biryardarî tevbigere. Bêdengî û bêçalakî li hemberî vê metirsiyê îxaneta li nirxên azadî, rûmeta mirovî û piştgiriyê ye û me hemûyan dixe metirsiyê. Beriya ku dereng bibe dema wê hatiye ku Yekîtiya Ewropayê bêyî dudilî ligel kurdan bisekine. Man û nemana wan ezmûna biryardariya me ye. Têkçûna wan tê wateya mayîna DAIŞ'ê. Em vê naxwazin."

# Pêwîst e em xwedî li keda Rêber Apo derkevin

**Asya Waşûkanî**

Dema ku em şoreşa Rojava dinirxînin em dibînin ku, şoreş xwedî roleke xwe ya wijdan û exlaqê mirovahiyê ye! Gelê Kurd bi fikir û felsefa Rêber Apo fêr bû ku gelekî, bindeste û welatê wî jî dagirkiriye. Tekez wê welat, gel û jin jî bi fikir û felsefa Rêber Apo, rizgar bibin û wê welatê me bibe weke bihiştê. Ji niha û pêde jî her çi dibe bila bibe wê tevahî xaka me, Kurdistan bi destê me were rizgar kirin û wê ti kes jî nikaribe, li pêşiya wê bibe asteng û paşde vekişîne. Wê hew kes bikare bi qedera gelê Kurd bilîze. Ji ber ku êdî gelekî xwe naskiriye û haj siyaseta dagirkeran heye. Nexasim kesên ku ji siyaseta dagirkerên biyanî bûne weke hutê dev vekirî û tenê, gelan dadiqurtîne. Volqana şoreşê wê dagirker û xayînan di nava pêlên xwe de bifetisîn e. Weke ku têye zanîn şoreşa Rojava bi mohra jinê hatiye hûnandin, îro jinan ciyê xwe di refên herî pêşiyê de girtin û rola xwe jî pir baş leyîstin û pêşengtî kirin. Herçiqasî ezmûna şer ya jin û ciwanan di şerê bajaran de kêm be jî, lê di nava şer de pijiyan û bi wêrekî û qehremanî şer kirin, di gelek ciyan de mêran sengerên xwe berdan lê jinan, li berxwedan û şer kirin. Jinên weke Warşîn Dêrik, Nûda Urfa, Sozdar Dêrik, Hêvîdar Dêrik, Rêvan Kobanê, Arîn Mîrkan; Avesta Xabûr û Barîn Kobanê û bi sedan rêhevalên weke wan canê xwe kirin mertal.Têkoşîn û berxwedana wan şêre jinan bi kelecan û coşeke mezin çûna şehadetê bandora xwe li ser mêrxasan jî kir û hemûyan bi hevre mil bi mil di sengerên şerê dijwar de şer kirin û warê xwe ji destê tundrewên herî xeternak rizgar kirin. Keç û xortên Kurdistanê bi lehengî şer kirin û bûn abîdeyên lêgerên jiyana birûmet, wekev û azad. Wan jinên çeleng bi wêrekî, bawerî û bi vîneke pir xurt cesaret dane ciwanan û mil bi mil di heman sengerê de li hemberî wan çetên dirinde, şer kirin û liberxwedan. Bi wê hêza jin û mêran a hevgirtî bi lehengî, li her devera Rojava û Bakur û Rojhilatê Sûriyê şer û berxwedanî hate kirin.

Gerek were zanîn ku tu hêzê û di navê de hêzên yekgirtî yên Emerîka jî bêyî qehreman û çelengên YPJ ê û YPG'ê nekarîn gavekê bavêjin û hîna jî wiha ye û gerek gelê me serê xwe bi vê yekê bilind bikin û li ser şêre jin û mêrxasên xwe destanan xêz bikin. Tekez gerek gelê Rojava û gelên Bakur û Rojhilatê Sûriye, wan jinên wêrek û serhildêr tevî wan xortên çeleng û şerê wan ê rûmetê qet ji bîra neke û xwedî lê derkeve. Di heman demê de li ked û têkoşîna Rêber Apo ya 19 salan xwedî derkeve û wê têkoşînê berdewan bike. Rêber Apo gelê Kurd fêr kir ku wê çawa xwedî li xwe derkeve û têkoşîneke wijdanî û exlaqî bimeşîne.

Îrojî em berhema wê hizrîna wijdanî û exlaqî di têkoşîn û hewildana, gelê Kurd li Rojava û gelên Bakur û Rojhilatê Sûryeyê dibînin û em hemû jî dizanin bê ka çawa roj bi roj pileya yekitî, xwişk û biratiya gelan bilind dibe û bandora xwe li ser tevahî gelên cîhanê jî dike. Bi fikir û ramanê Rêber Apo fikir û felsefa jiyana wekhev û azad berbelavê tevahî mirovahiyê dike. Herçiqasî gelê me yekgirtî be wê ewqasî jî bandora xwe, li ser gelên hawîrdor jî bike û wê rêkê li pêşiya xwişk û biratiya gelan veke û Rêber Apo rola pêşengtiya yekîtiya gelan daye, gelê Kurd û têkoşîn û xebat tenê dikare xwedî li keda Rêber Apo derkeve. Careke din gerek her kes zanibe ku Rêber Apo dibêje: Ez ti tiştekî ji kesî naxwazim û bera ti kes xwe ji bo min feda neke û ez jî erkê xwe yê Rêbertiya gelê xwe pêktînim; lê gerek her kes jî bizane ku 52 sale ku ez li ser pira selatê dimeşim û ger kî ji we li şûna min baya wê 10 rojan jî liberxwe nedaba. Em hemû jî vêya dizanin, lê me xwe bêdeng kiriye û çavê me jî weke çavê lawiran mest bûye û weke ku em nabînin û ev jî şermeke pir mezine û nabe ku em xwe wiha bikin û rola 3'ê meymûnan bilîzin. Ger ku ji van gotinên Rêber Apo were famkirin wê gelekî baş be, ji ber ku Rêbertî me rexne dike û di heman demê de; rêya têoşînê jî nîşanî me dide û dibêje: Gerek mirov li hemberî keda mirovan bi hurmet be û di nava heqîqetê de jî kûrbibe. Beriya wê jî Rêber Apo ji me re gotiye fikir, zikir û çalakî ku ew jî wateya xwe wiha ye mirov xwedî aqil û hişe û gerek wî hişê xwe bikar bîne û nasbike. Rêber Apo" dibêje Min ji xwe de destpê kir û ez rojê 20 katjimêran kar û xebat, dikim û dem dema xebatê ye' ji xwe hûn ji dervene û xwedî derfetin û gerek hûn xebateke pirxurt bikin".

# Têkoşîna me feraseta şoreşa civakî ye

**Arîn Koçer**

Dihat gotin, "Wê sedsala 21. bibe sedsala Kurdan." Hat wê astê. Dibe sedsaleke ku Kurd derdikevin pêş. Berxwedana li dijî DAIŞ'ê ya li Rojava, civaka Kurd anî asteke wisa. Rojavayê Kurdistanê dibe beden, hêvî û bendewariyên hemû parçeyên Kurdistanê xwedî li hev derkevin. Ne tenê ji bo gelê Kurd û Kurdistanê, Rojava dibe hesreta jiyana azad a hemû gelên cîhanê û jinan.

Rojava giyan, zanebûn û dilê Kurd diafirîne. Axa Rojava giranbİha û bi nirx e. Têkoşîna me feraseta şoreşa civakî ye. Kurdistan ji dîrokê ve mozaîkeke etnîk e, xakeke qedîm û pir têkel e. Rojava rûmeta gelê Kurd e. Têkoşîna me jiyana civakî qezenckiri ye. Giyanwerî daye qezenckirin. Weke hebûn mirov nikare ji xwezayê qut bibe. Ji ber ku mirov berhemeke xwezayê ye û mîna her hebûnê di dawiyê de digihêje xwezayê û bi wê re dibe yek.

Di Şoreşa Rojava de me dît ku Kurdistan ne çar parçe, yek welat e. Yekbûna gelê Kurd gihiştiye lûtkeyê. Ev rastî bi awayekî berbiçav li holê ye. Gelê me îlhamê dide ku em zêdetir berê xwe bidin têkoşînê û çeperên berxwedanê. Gelê Kurd bi awayekî baldar xwedî li Şoreşa Rojava derdikeve. Rojava Fikra azad, vîna azad û mirovê azad e. Rûmeta gelê Kurd e. Têkoşîna jinan, têkoşîneke tolhildanê ye. Şoreşa Rojava rûyê derve yê têkoşînê ya jinê ye. Lewma, xwedî roleke welê ye ku destkeftiyên têkoşîna jinê hîn bêhtir pêş dixe. Şoreşa Rojava bandoreke pir erênî û girîng li ser pêşketina têkoşîna jinê kiriye. Têkoşîna gelê Kurd di qonaxeke herî dîrokî de ye. Kurd dixwazin bi nasnameya xwe, xwe bi rê ve bibin.

Di Şoreşa Rojava de polîtikayek bijare ya Kurd derdikeve holê. Divê nasnameya Kurd bigihe îfadeya polîtîk û zagonî. Bi salane gelê Kurd bi tûndî û şîdetê re rûbirû maye. Em cîhaneke bê tundî û bê şîdet dixwazin. Şoreşeke serkeftî ya Kurdistanê, şoreşeke baş a mirovatiyê ye. Divê em ji bo hebûna xwe şer bikin û di şer de jiyana azad derxin holê. Azadiya mirov bi şer tê afirandin. Şerê em dikin jî şerê heyînê ye. Azadî berdêl dixwaze. Serkeftinên mezin jî berdêlên mezin dixwazin. Ji bo rastiyeke weke civaka Kurd ku ji cewherê xwe hatibû qutkirin û dagirkirin, nirxên wî yên herî mirovî hatibûn desteserkirin. Dema daxwaza wan nirx û mafan kirine jî rastî êrîş, komkujî û sirgûnan hatine. Lewma gelê Kurd şer û berxwedan weke pêwîstiyeke jiyanê ya bingehîn girtiye dest.

Mafê jiyanê, mafê mirov ê herî bingehîn û pîroz e. Felsefeya parastina rewa jî li ser esasê mafê jiyanê yê pîroz ê mirov pêş dikeve. Mafê herî bingehîn ê demokrasî pêşkêşî civakê dike mafê parastina rewa ye. Parastina rewa di mercên dagirkeriyê de watedar dibe. Şerê parastina rewa li hember sîstemeke biyanî ya hebûn û azadiya gelekî binpê dike rêya herî bingehîn a sazkirina demokrasiyê ye. Şoreş, di heman demê de xeyaleke mezin jî bi xwe re ava dike. Çiqasî hêvî, xeyal û asoya mirov fireh be şoreş ewqasî pêş dikeve. Li Kurdistanê hêza mirov bi hewldana şoreşgerî dest pê dike. Rastiya Şoreşa Rojava êdî cîhanî bûye. Şoreşa me ya li Kurdistanê şoreşa hezkirinê ye. Şoreşa me şoreşa ku jin bi hebûn, nasname û rengê xwe pêşengtiyê dike. Ev çiqasî pêk were, wê nirxên şoreşa me ya enternasyonal ewqasî bilind bibe. Divê mirov di nirxên azadiyê de xwedî serkeftin be. Li welatekî weke Kurdistanê bi gelek xisletên xwe ve ji mêj ve qada jiyanê pêk hatiye. Li Kurdistanê têkiliya şoreşê bi hezkirin û xweşikbûnê re çi ye? Angu mirov dikare bêje ku bi têkoşîna me re hêviya jiyanek xweşik pêş ketiye. Jiyana xweşik û jiyana watedar hîsên herî bi hêz û afirîner in. Dîroka gelê Kurd, pêşeng û şopdarên her tim dijîn diafirîne. Vejîna gelê Kurd gelekî hêja ye. Welatparêziya gelê Kurd gelekî kûr e. Şoreşger mirovên azad in. Kes nikare pêşiya mirovê azad bigire. Em soza bi her awayî bilindkirina têkoşînê didin. Berdêla wê çi bibe bila bibe em ê vê têkoşînê bi serkeftinê tacîdar bikin.



## Entegresyon erê, lê hişmendiya çeteyan na

**Gulîstan Xalid**

Di êrîşa şeşê çileyê de ku ji aliyê çeteyên HTŞ û çeteyên girêdayî dewleta Tirk ve li ser Rojavayê Kurdistanê pêkhat , me careke din dît ku bi riya van çeteyan hêzên komploger li aliyekî êrîşî gel dikin, komkujiyan pêktînin û nijadperestiyê dikin, li aliyeke din li hemberî jin jî bi awayeke taybet kiryarên hovane û bê exlaq pêş dixin. Di van êrîşên çeteyan de em dîsa bûne şahidê hişmendiyeke ku hefnîkî girtiye û hêrseke mezin li hemberî jina kurd dijîn. Çima ev hêrs û çima bi taybet jina kurd; Jiber di van salên şoreşê de jin di her alî de rola xwe leystin, di warê parastin, di qada siyasî, civakî û diplomasî de, jin meclis û rêveberiyên xwe di hemû qadan de bi rêxistin kirin. Ev jî hêzbûyîna civaka ku bi pêşengtiya jin ve şoreşê pêş dixe dida nîşandan. Weke mînaka Hevrîn Xelef hevseroka Partiya Sûriye Pêşeroj ku di dema sala 1919 de êrîşên li ser Serêkaniyê û Girê Spî bi destên çeteyan bi awayeke hovane hate qetil kirin, li Şêxmeqsûd jî bedena jina şervan ku ji ciheke bilind ve hate avêtin û li Reqa jî jineke şervan ku piştî şehîd dibe keziyê wê hate jêkirin, dide nîşandan ku ev çeteyên wekîl û berdevkên hêzên komploger çiqas bertekeke zanistperest bi qilifeke olî, modern û nijadî xwe pêçandine li hemberî azadiya jinan, civakê ne .

Li gorî van çeteyan û vê hişmendiya kufikgirtî gereke jin tu car azad nebe, jin were mulkkirin, firotin, mejiyê xwe bikar neyne, dengê wê dernekeve, rûyê wê xuya nebe, vîna xwe nebe...û hwd. em bi hişmendiyeke ku dixwaze pêşketina civak û jin paşve vegerîne û jiyaneke rezîl û rizyayî dîsa li ser civakê bi hovîtî ferz dikin. Bifikirin ev HTŞ'e ya ku niha li ser desthilatdariya sûriyeye û jê re dibêjin desthilatdariya demkî ne tenê dixwaze Sûriye di warê siyasî bi desthilatdariyeke merkezî be, dixwaze ku hemû civakên di hindirê Sûriye de vegerîne jiyana çaxên navîn û xirabtir jî. Ev hişmendî îro xeteriyeke pir ciddiye ji bo tevayî gelê Sûriyeye. DAIŞ ku ji Sûriye hate paqijkirin bi HTŞ re dîsa zindî dibe. Ji mirov re wiha tê ku DAIŞ rewabûna xwe bi naveke cûda derdixe pêş. Civaka kurd li Rojava bi tenê jî bimîne ewê teslîmî vê hişmendiyê nebe û heya ku ferdek xwe hebe jî ewê li hember vê hişmendiyê di hemû waran de têkoşîn bike. Gel xwedî vê sozê û vê seknê ye. Gelê kurd ne li hember Entegresyonê ye, û tu pirsgirêka gel ku bi gelên herêmê re jiyan bike tuneye ku ji xwe heya niha jî wiha bûye, tu carî gelê kurd bi tenê di erdîngariyekê jiyan nekiriye. Hêrsa gel li hemberî hişmendî û kiryarên çeteya ya li hemberî jinan zêdetir bilind bû û israra wê ya berxwedanê jî bi van dîmenan re zêdetir derkete pêş. Jiber ev civak azadiya xwe di azadiya jin de feam kiriye û ji bo vê civakê jin pîroze. Elbette gelê kurd di tevahî Sûriye de rola pêşengtiya sistema demokratîk û Sûriyeke demokratîk ku bi hemû pêkhateyên xwe ve armanc digirt girte ser milê xwe, ji bo vê jî gelek bedel da. Gelê ku xêrxwaziya hemû gelan dixwaze îro bi tenê jî bimîne ewê dev ji armancê xwe bernede, lê rastiyeke wiha heye, mîna ku Gandî dibêje: ger ku xencer di pişta te debe tu ancax bi derxistina vê xencerê re destpêkê mijûl bibe. Îja weke vê mînakê di rewşa heyî ya li Rojavayê kurdistanê û civaka kurd de jî tê jiyan kirin. Ger ku xencer di pişta wê de be û heya ku vê xencerê ji pişta xwe dernexe ewê nikaribe xencara di pişta hawirdorê xwe de jî derbixîne. Ev xencer ewê ancax bi berxwedanî, yekîtiya gelê kurd û pêşengtiya jinan ve were derxistin. Ji lewma gel bi sekna xwe jî îfade dike ku ew ne li dijî entegresyonê ye, ew ji hişmendiya çeteyan re dibêje na û di hişmendiyeke azad de bi israre.



# Gavên pêk anîna peymana 29'ê Çileyê di navbera QSD'ê û Hikûmeta Demkî de

**Lihevkirina 29'ê Çileyê yê di navbera QSD'ê û hikumeta demkî ya Sûriyê, bi rêya bicihkirina ewlehî û hemahengiyê, civînên îdarî, leşkerî û destpêkirina erkên parêzgar, li ser erdê li bajarê Heseke, Kobanê û Qamişlo hatin gotûbêjkirin.**

**Hêvî Keleş/ Qamişlo**




Di 29'ê Çile de, lihevkirineke berfireh di navbera Hêzên Sûriya Demokratîk û Hikûmeta Demkî ya Sûriyeyê de hate ragihandin, ku agirbestek û destpêkirina pêvajoya entegreyê gav bi gav a hêzên leşkerî û îdarî destnîşan dike, di nav de vekişîna hêzên leşkerî ji xetên pêşîn, bicihkirina hêzên ewlehiyê li navendên Hesekê, Kobanê û Qamişloyê, avakirina yekîneyên leşkerî yên nû, ji bilî yekbûna saziyên Rêveberiya Xweser û birêkûpêkkirina karmendan.

Herwiha ew mijarên mafên sivîl û perwerdehî yên Kurdan û garantîkirina vegera kesên koçberkirî, wekî beşek ji hewildanên ji bo yekkirina axê, xurtkirina aramiyê û ji nû ve avakirinê, dihewîne. Gavên li ser erdê ji bo bicihanîna lihevkirina 29'ê Çile di navbera Hêzên Demokratîk ên Sûriyeyê û Hikûmeta Demkî ya Sûriyeyê de bileztir birêve diçe, bi rêze gavên bi rêk û pêk yên ku ji destpêka Sibatê ve hatine avêtin, ku veguherîna lihevkirinê bo sepandina pratîkî nîşan didin.

Di 1'ê Sibatê de, civînek ji bo nîqaşkirina gavên pratîkî yên yekem, dûrî medyayê di navbera rêveberiya ewlehiyê ya Hesekê yê ku ji aliyê Hikûmeta Demkî ya Sûriyê ve hatiye destnîşankirin, Merwan Elî û rêvebriya Hêzên Ewlekariya Hundirîn ên li Rojavayê Sûriyê de, bi awayê du civînan li bajarê Hesekê û Qamişlo, bi beşdariya serokê Hêzên Ewlekariya Hundirîn, Mehmûd Xelîl Elî, ku bi navê Siyamend Efrîn tê nasîn, hat lidarxistin.


Di 2'ê Sibatê de, Hêzên Ewlehiyê yên girêdayî hikûmeta demkî li deverên ku bi hevrêziya bi hêzên ewlehiyê yên Hundirîn yên girêdayî Rêveberiya Xweser yên ku berê hatibûn destnîşankirin, ketin gundewarên Kobaniyê, ev gavekbû ku wekî nîşaneya destpêkirina xebata hevbeş li ser dosyaya ewlehiyê hate hesibandin.

Di heman rojê de, hêzên ewlehiyê yên Hikûmeta Demkî ya Sûriyê bi awayekî hevrêzkirî ligel Hêzên Ewlekariya Hundirîn yên Rêveberiya Xweser a herêma Cezîrê derbasî bajarê Hesekê bûn, ku ev yek jî nîşan dide ku hevrêziyeke baş di navbera her du aliyan de heye. Gav di 3'ê Sibatê de berdewam kir, bi derbasbûna Hêzên Ewlehiyê yên Hikûmeta Demkî ya Sûriyeyê bo bajarê Qamişloyê, bi hevkariya Hêzên Ewlehiyê yên navxweyî yên Rêveberiya Xweser a herêma Cezîrê.

Di asta îdarî de, di 5'ê Sibatê de, namzetê Hêzên Sûriya Demokratîk ji Şamê, Nûredîn Îsa, piştî ku wekî parêzgarê Hesekê hate tayînkirin vegeriya û ji aliyê niştecihên bajêr ve hate pêşwazîkirin, di dîmenek ku wekî nîşaneya berdewamiya ji nû ve sazkirina çarçoveyên îdarî re, digel lihevkirinên berdewam, hate hesibandin.

Di heman rojê de, şandeyek ji Rêveberiya Xweser a Demokratîk a li Kobanê li avahiya Helebê bi fermandarê ewlehiya Hundirîn yê Helebê, Eqîd Mihemed Ebdulxenî, cîgirê waliyê Helebê Elî Henûra û hejmarek ji berpirsên Hêzên Ewlehiyê yên girêdayî Hikûmeta Demkî re civiya.

Şanda Rêveberiya Xweser ji serokê Meclisa Rêveber Ferhan Hac Îsa, ligel nûnerên Rêxistinên Cûrbecûr û Rêveberiya Xweser li Kobaniyê. Herwiha serokên eşîran ji pêkhateyên Ereb pêk dihat. Gotûbêj li ser pirsgirêkên herêmî û mekanîzmayên ji bo bicîhanîna bendên lihevkirinê, bi armanca piştgiriya aramiyê û xurtkirina hevrêziya saziyan, hatin kirin.



Di çarçoveya rêça leşkerî de, bajarê Hesekê di 6'ê Sibatê de civînek li dar xist ku tê de Rêveberên Hêzên Sûriya Demokratîk, bi serokatiya endamê Fermandariya Giştî ya HSD'ê Çiya Kobanê û rêveberên komên Hikûmeta Demkî, bi serokatiya Hemze El Hemîdî, civiyan. Civîn ji bo nîqaşkirina qonaxên yekbûna leşkerî û mekanîzmayên pêkanîna wê bû, ku yek ji gavên pratîkî yên herî berbiçav ên têkildarî ji nû ve sazkirina hevkariyê di navbera her du aliyan de ye.

Piştî civînê, gera hevbeş a meydanî pêk hat, ku tê de hejmarek xalên Hêzên Sûriya Demokratîk hebûn, ku li gorî çavkaniyan, biryar e ku bibin navendên daîmî ji bo her sê lîwayên ku tê plankirin li Hesekê, Qamişlo û Dêrikê werin avakirin. Di 7'ê Sibatê de, li parêzgarê Hesekê, Nûredîn Îsa dest bi erkên xwe kir û fermandarê Hêzên Ewlehiyê li Hesekê, ku ji hêla Hikûmeta Demkî ya Sûriyê ve hatiye tayînkirin, Merwan El-Elî, serdana parêzgarê Hesekê kir û pîrozbahî li wî kir.

Di 8'ê Sibatê de, ji bo nîqaşkirina mekanîzmayên bicîhanîna bendên lihevkirina 29'ê Çile û hevrêziya di navbera her du aliyan de ji bo rakirina dorpêça li ser Kobanê û xurtkirina hevkariya ewlehiyê li bajar û gundewarê wê, da ku rewşa ewlehiyê baştir bibe û tevgera niştecihan hêsan bibe, di navbera Hêzên Ewlekariya Hundirîn ên li Kobanê û Rêveberiya Ewlehiyê ya li Helebê de civînek hat lidarxistin. Gotûbêj li ser pêkanîna lihevkirina 29'ê Çile û rêbazên baştirkirina hevrêziya ewlehiyê di navbera herdu aliyan de bûn. Di nav şandeya Asayîşê de hevseroka Ewlekariya Hundirîn a Kobanê, Arîn Kobanê û çend endamên din ên hêzên ewlehiyê beşdar bûn. Şande ji aliyê Kolonel Mihemed Ebdulxenî û endamên Hêzên Ewlekariya Hundirîn ên li Parêzgeha Helebê ve li navenda Ewlekariya Hundirîn a li bajêr hate pêşwazîkirin.

Di 9'ê Sibatê de Şandeyek ji Hikûmeta Demkî ya Sûriyeyê, bi Merwan El-Elî, rêvebrê Ewlehiya Hundirîn ya parêzgeha Hesekê, serdana rêveberiya zeviyên petrolê yên Rimeylanê kir da ku berdewamiya bicihanîna şertên peymana 29'ê Çile bike. Civîn li navenda Rêveberiya Zeviyên Petrolê li Rimeylanê, dûrî medyayê, pêk hat. Li gorî çavkaniyan, herdu aliyan li ser makanîzmeya xebatê yên rêveberiyê nîqaş kirin.

Ev gavên li pey hev, ji bicihkirina ewlehiyê ya hevbeş bigire heya civînên siyasî û leşkerî, nîşan didin ku pêkanîna lihevkirinê bi rengekî rêk û pêk dimeşin, ku aliyên ewlehî, îdarî û leşkerî dihewîne, di nav hewldanên avakirina teşeyek ji xebata hevbeş ya gav bi gav de.

Çavdêr bawer dikin ku gavên li pey hev di nav çend rojan de meyleke zelal û cidî nîşan dide ji bo xurtkirina têgihîştinên li ser erdê, wekî amadekariyek ji bo qonaxek ku dibe ku bibe şahidê berfirehbûna dosyayên entegrasyonê û rêveberiya saziyan, tevî vê rastiyê ku hejmarek pirsgirêk hîn jî mijara danûstandin û ceribandinên meydanî ne, di nav de dorpêça li ser Kobaniyê, herwiha dagirkirina berdewam a Tirkiyê li ser deverên Kurdî û înkarkirina mafê vegera koçberan.

# ‘Kurd bi ruhê netewî ji bo Rojava kom bûn’

Hevserokatiya Ofîsa Têkiliyên Dîplomasî a PYD’ê Sema Begdaş diyar kir ku dema mijar dibe gelê Kurd hemû hêzên desthilatdar ên ku di koka xwe ya dîrokî de dijminên hev in dibin yek û êriş dikin, lewma pêwîst e Kurd jî bi wê helwestê xwe bikin yek, ji ber hêza Kurdan di yekîtiyê de ye û got, “Hemû Kurd bûn parazvanên Rojava û tevlî berxwedanê bûn.”

**Ronahî Sadûn/Qamişlo**

Komployên li ser gelê Kurd bê ser û berin, ji ber dema mirov dîroka Kurd dixwîne yan jî bixwaze binivîse, dibîne ku ew di gelek Kompoloyan re derbas bûne. Hemû Komplo jî li ser yek bingehê û bi eyînî dewletan hatiye meşandin, bingeh jî ew e; qirkirina gelê Kurd e, rakirina destkeftiyên Kurd û tunekirina wan e. Ev jî ji parçekirina Kurdistanê bigire heya roja îro li her çar parçeyên Kurdistanê komplo hatine meşandin. Niha jî li Rojavayê Kurdisatnê piştî ewqas sal ji şoreşê, komployeke navdewletî li ser tê meşandin. Ev hemû jî berdewamiya peymanên Qesra Şêrîn û Saykis-Pîko ne. Lê li hemberî her tiştê ku bû û dibe, gelê Kurd li ber xwe daye û komplo vala derxistin. Îro jî bi hêza gelê Kurd li Kurdistanê û cîhanê, Kompolya li ser Rojava vala tê derxistin.

Derbarê rewşa Rojava, şandeyên ku serdana Rojava kirin, xebatên bo yekrêzî û yekîtiya Kurdî, Hevserokatiya Ofîsa Têkiliyên Dîplomatîk a Partiya Yekîtiya Demokratîk PYD’ê Sema Begdaş ji Rojnameya me re axivî.

### ‘Projeya demokratîk armanca sereke ya êrişan bû’

Sema Begdaş diyar kir ku êrişên li ser Rojava ji Helebê dest pê kir û ber bi tevahî herêmê ve hat û wiha got: “Ev nêzî mehekê ye ku êriş li ser herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê berdewam e, ev êriş ji taxên Şêxmeqsûd û Eşrefiyê yên Helebê dest pê kir û ber bi tevahî herêmê ve hat, heta gihaşt navçeyên Çilaxa û deverên dîtir. Ev êriş encama komployeke hêzên hegemonin ku berjewendiyên wan di vê herêmê de hene, lewma li ser bingehê lihevkirineke van hêzan, êriş hatin destpêkirin. Herwiha êrişên li ser herêmê li ser projeya Rêveberiya Xweser û pêkhateyên Bakur û Rojhilatê Sûriyê bû. Ji ber projeya rêveberiyê bi berxwedaniya gelên herêmê pêk hatibû, bi taybet ku ew projeyeke demokratîke di nav xwe de her kesî digire û jin pêşengiya wê dike. Lewra êriş di asta pêşîn de li ser vê projeyê û qirkirina gelê Kurd bû. Di heman demê de ev zêdeyî salekê ye ku li



Sûriyê gelek komkujî û qirkirin li ser gel û pêkhateyên dîtir pêktên. Komkujî destpêkê li ser gelê Elewî û Durzî destpêkirin, niha jî berê xwe dane gelê Kurd û projeya netewa demukratîk.”

### ‘Kurd rabûn ser piyan’

Sema Begdaş eşkere kir ku bersivdayîna seferberiyê gelekî xurt bû û wiha anî ziman: “Encamên êrişan û encamên negihaştina lihevkirinekê ku xwestekên gel û fedekariya wan pêk tîne, rewşa seferberiya giştî ji aliyê Rêveberiya Xweser ve hat ragihandin ku ji Kurdên li hemû parçeyên Kurdistanê û cîhanê tê xwestin rabin ser piyan û li hemberî van êrişên ku hebûna Kurdan armanc digre, helwestên xwe nîşan bidin. Bersivdayîna seferberiyê jî li Kurdistanê û tevahî cîhanê gelekî xurt bû ku gelê Kurd di hemû aliyan de rabûn ser piyan. Lidarxistina meşan, çalakî, şermezarkirin û serdana balyozxaneyan, herwiha pêngaveke xurt ji şandeyên ku serdana herêmê jî kirin hebû û heya niha jî ev yek berdewam e.”

### ‘Şoreşa Rojava şoreşa mirovahiyê ye’

Sema Begdaş tekez kir ku tecrûbeya Rojava bandorê li parçeyên din ên Kurdistanê dike û wiha bilêv kir: “Rojavayê Kurdistanê beşê herî biçûk ê Kurdistanê ye, lê tecrûbeya wê bandorê li ser Bakur, Başûr û Rojhilat jî dike. Ji ber li Rojava şoreşeke rasteqîn hebû û ew destkeftiyeke ji aliyê Kurdan ve hatiye bidestxistin. Di heman demê de Şoreşa Rojava dengê xwe gihandiye her derê, çi li ser asta Sûrî, Rojhilata Navîn û cîhanê be, ji ber wê li hemberî çeteyên DAIŞ’ê şerkir û mirovahî tev parast û xeteriya wê li ser cîhanê bi dawî kir. Hem jî berxwedana jinên Kurd, Projeya Demokratîk û hevgirtina pêkhateyan hişt ku gel, tevgerên demokratîk ên jin û giştî û kesên naskirî û navdarên cîhanê, ji bo Rojava serhildan û piştgiriyê bikin û gotin; Divê parastin û garantiyek ji bo şoreşa Rojava hebe, ji ber ew şoreşa mirovî ye di asta yekem de, herwiha ew şoreşa jin, demokratîkbûnê û azadiyê ye.”

### ‘Gelek şandeyan serdana Roava kirin û piştgiriya şoreşê kirin’

Sema Begdaş diyar kir ku di nava rewşa heyî de gelek şandeyan serdana Rojava kirin û wiha axaftina xwe domand: “Ji xwe gelek şandeyan serdana Rojava kirin ku ji Bakurê Kurdistanê DEM Partî, partiyên cuda, tevgerên jinan û malbatên Şehîdan bûn, herwiha nûnerên partiyên Tirkiyê jî ji partiyên Çepgir tevlî van şandeyan bibûn. Di heman demê de şandeyek ji parlemana Başûrê Kurdistanê, şandeyek ji hunermendên Kurd ên li Ewropa, şandeyek ji tevger û kesayetên muxalefetê ji Başûr jî serdan kirin. Hem jî şandeyên Biyanî serdana tevgerên jin û Rêveberiya Xweser kirin. Ev şande bi gelek aliyên cuda re jî hevdîtin kirin û piştgiriya xwe ji bo Şoreşa Rojava tekez kirin û diyar kirin ku heger ev şoreş têk biçe wê bandorê li ser parçeyên din ên Kurdistanê jî bike.

Tevgereke xurt a şandeyan heye û hîna jî serdana şandeyan berdewame. Hatina şandeyan ji bona Rojava, di nava berdewamiya êrişan û Koçberiyê de, dide xuyakirin ku şandeyên ku hatine amadebûna xwe ji bo Rojava piştrast kirin û pêwîstiya hevkariya navneteweyî ya tevahiya rêxistinan ji bo piştgirî û parastina destkeftiyên şoreşê destnîşan kirin. Hemû axaftin di vê çarçoveyê de bûn ku wan amadebûn û piştgiriya xwe ji Rojava re diyar kirin û gotin; “Şoreşa Rojava şoreşeke girîng e divê destkeftiyên wê werin parastin, ew şoreşa sedsala 21’emîn e, şoreşa jin û ya gelan e ku bang li demokratîkbûn û aştiyê dike.” Herwiha şandeyan insyatîveke baş di aliyê mainewî û madî de jî kirin. Hem jî diyar kirin ku wan jî




moral ji berxwedana Rojava girtin û hestekî hevbeş bi hev re hat parvekirin.”

### ‘Helwesta navdewletî bi berxwedana gel hat guhertin’

Sema Begdaş anî ziman ku wan tu carî hêvî ji hêzên navdewletî nekirine û wiha pê de çû: “Dema em behsa hêzên navdewletî dikin, ev dewlet her tiştî ji bo bidestxistin û pêkanîna plan û berjewendiyên xwe kar dikin, ji wan re ne girînge ku gel bên qirkirin, an jî demorkatî û aştî hebe. Ji ber ev hêz li ser kirîz, şer û derxistina pevçûnan di navbera pêkhateyan de, jiyan dikin. Lewra em tu hêviyê ji wan nakin. Ji bo wê em dizanin bêdengiya navdewletî weke hêz ne li gorî peymanên navneteweyî û mafên mirovan e. Lê berxwedana gelê Kurd dîrokî bû ku gelê Kurd bi melyonan li tevahiya cîhanê rabûn ser piyan. Herwiha yekîtiya netewî ya li her çar parçeyên Kurdistanê bi yek ruhî pêk hat û hemû jî bûn parazvanên Rojava û tevlî şoreşê bûn. Bi sedan ciwanên Kurd sînorên ku dewletan xêz kirine, rakirin û tevlî berxwedanê bûn, pê re jî yekîtî û hevgirtina gelê Kurd hebû.

Xala din jî ya ku hişt tevgereke navdewletî çêbibe, ew bû ku di nava van salên şoreşê de têkiliyên me yên dîplomasî li ser asta cîhanî hatibûn pêşxistin û em bi xwe jî tevlî gelek konferanên li ser asta cîhanî bibûn. Di heman demê de gelek kesan serdana herêmê kiribûn û tecrûbeya li vir bi çavan dîtibûn û bi awayekî serkeftî nirxandibûn. Lewra wan li hemberî van êrişan bertek û hewlestên xwe raber kirin û heya niha ew di nava hewldanan de ne ji bo parastina Rojava. Vê jî bandor kir ku civaka navdewletî bikeve nava tevgerê de. Herwiha senator Lîndsîgraham bi daxuyaniyekê got ku gelê Kurd isbat kirin hêza girseya gel ji ya dewletê xurt e, ev jî hemû bi piştgiriya gelê Kurd û hivalbendên Kurdan pêk hat.”

### ‘Hêza Kurdan di yekîtiyê de ye’

Sema Begdaş axaftina xwe wiha qedand: “Her tim mijara yekîtiya netewî armanca me ya istrateîjîke ku em ji bo wê kar û xebatê dikin. Lê îro roj “Yekîtiya Netewiya Kurd” pêwîstiyekî istratîjîke gerek pêk be, ji ber îro êriş li ser gelê Kurd e û destkeftiyên wan di xeteriyê de ne. Ne tenê li Rojava lê li tevahiya Kurdistanê destkeftiyên Kurdan di metirsiyê de ne. Ji ber hêzên hegemon dixwazin dîsa di vê sedsalê de Kurdan bixin qurbaniya lihevkirin û planên xwe. Lewma girîngiya Kurdan bi yekrêzî û yekîtiyê li hemberî êrişan heye. Ji bo vê jî niha hewldan hene, beriya niha Konferansa Netewî ya Kurd çêbû, şandeyek hat avakirin ev xebat gerek hîna em berdewam bikin. Ji ber hêza me di yekîtiya me de ye wekî çawa ev hêzên desthilatdar xwe dixin yek tevî ku di koka xwe ya dîrokî de dijminên hev in, lê dema mijar dibe Kurd, ew dibin yek û êriş dikin, gelê Kurd jî gerek bi wê helwestê xwe bikin yek. Ji ber Kurdên niha ne Kurdên berî sed salî ne, Kurd îro xwedî rêberin, felsef, nasname, projeyên demokratîk in û têkoşînin.”



# ‘Di vê qonaxa hesityar de pêwîst e em li kêleka şervanên xwe bin’

Rewşenbîrên kantona Cizîrê diyar kirin ku rêkeftina 29'ê Çile di encama berxwedana gel de çêbû û gotin, “Di vê qonaxa hestiyar de divê em li kêleka şervanên xwe bin. Divê şagirt bi zimanê Kurdî bixwînin û ev mafekî rewa ye. Pênûsa rewşenbîran çeka wan e, divê baş bi kar bînin.”

**Reşo Mihemed/ Qamişlo**

Piştî êrîş û komkujî û binpêkirinên li dijî gelê Kurd li Sûriyê û xiyaneta ku li hundir û ser asta navdewletî rû bi rû man, yekîtiya Kurdan bûye bingeha berxwedanê û bidestxistina armanc û daxwazên gelê Kurd. Ji bo rê li ber êrişên qirkirinê were girtin, peymanek di navbera QSD, Rêveberiya Xweser û hikumeta demkî de hat îmzekirin. Derbarê rewşa ku Rojavayê Kurdistanê tê re derbas dibe, hem jî hevpeymana 30’ê Çile, rewşenbîrên kantona Cizîrê helbestvan Hesîna Ehmed û nivîskar Ebdulkerîm Mûsa ji rojnameya me re axivîn.

### ‘Di vê qonaxa hestyar de pêwîst e em mil bi mil li gel şervanê xwebin’

Ebdulkerîm Mûsa da zanîn ku di vê qonaxa hestyar de pêwîst e rewşenbîr li pişta QSD’ê bin û wiha got: “Dema ku gelê Kurd li kîjan parçeyê Kurdistanê dikeve tengasiyekê, Kurdên parçeyên din xewdî li parçeyê din derdikeve. Li hemberî komkujî û êrişên li ser Şêxmeqsûd û Eşrefiyê gelê Kurd bû yek. HTŞ’ê bi alîkariya dewleta Tirk û erêkirina Amerîkayê êrişî herêmên me kir. Ji Şêxmeqsûdê hetanî ku şer li hemû Rojava berfireh bû, li hemberî vî şerî jî berxwedaniyek hat meşandin, lê QSD’ê rastî îxanetê hat, bi sedema gurkirina agirê kîn û nefretê piraniya Erebên deverên Reqa, Tebqa û Dêrazorê li dijî QSD’ê rabûn, ev yek jî bi palpiştiya dewleta Tirk çêbû. Ji bo rawestandina şer peymanek di navbera QSD’ê û hikumeta demkî de hat îmzekirin. Çendîn ne li gorî dilê me be jî, lê divê em bi şervanên xwe re bin. Hêza me weke gencîneyeke zêrîne û li gel me ye, eger em piştgiriya hêza xwe nekin ew ê ji nav destê me here. Di vê dema heyî de em bi bin neketine, rast e qonaxeke zehmet e, lê divê hewldanên her kesî ji bo parastina destkeftiyên gelê Kurd hebin. Herwiha tişta ku tê xwestin, lidarxistina kongreyeke netewî ya Kurd e. Xelasiya me di kongereya niştîmanî ya Kurdî de ye, dema ku ev kongr li dar bikeve cîhan bi temamî wê piştevaniyê bide me.”

### ‘Yekrêziyê rûmeta gelê Kurd parast’

Mûsa diyar kir ku yekrêziya Kurdî rûmeta gelê Kurd li Rojava parastin û wiha bi dawî kir: “Di dema heyî de bi rûdana van geşedanan em dibînin ku hemû hêz di serî de dewleta Tirk dixwazin Rojavayê Kurdistanê bixin çemberê. Êrişên ku li ser Rojavayê Kurdistanê hatin kirin di çarçoveya planeke navdewletî de bûn. Berxwedaniya gelê Kurd bû sedemeke rasterast ji bo xurtkirina rihê yekîtiya neteweyî û xurtkirina Kurdperweriyê di warê nivîsîna çarenivîsa gelê Kurd bi awayekî hevpar. Ev berxwedanî ne li dijî tu gel û civakê bû, lê ji bo parastina hebûn û rûmetê herwiha parastina destkeftiyên ku bi xwîna hezarê şehîdên gelê Kurd ên li Rojava hatine bidestxistin, ew şehîdên ku ji bo azadî, aştî û jiyana hevbeş canê xwe feda kirin. Rojava îro di rewşeke hestyar de ye, pêwîstiya me bi hişmendiyeke durist, rêxistin, piştgiriya siyasî û civakî heye da ku serkeftinên ku bi berdêlên giran hatine bidestxistin, biparêzin û mafên gelê Kurd li Rojava misoger bikin.”

### ‘Divê şagirt bi zimanê Kurdî bixwînin û ev mafekî rewa ye’

Hesîna Ehmed tekez kir ku divê xwendekarên Kurd bi zimanê Kurdî bixwînin û wiha anî ser ziman: “Wekî tê zanîn di dema dawî de gelê Kurd li Rojavayê Kurdistanê rastî êrişê hat û di encama vê êrişê de rêkeftinek di navbera QSD’ê û hikumeta demkî de hat çêkirin. Peymana ku hatiye îmzekirin, ji milê leşkerî ve ye, hem jî wê li ser mafê gelê Kurd ê siyasî, çandî û netewî raweste. Çendîn ev hevpeyman ne li gorî daxwazên gelê Kurd be jî, lê gelê Kurd di qonaxa hebûn û tunebûnê re derbas dibe. Vaye xalên entegrasyona leşkerî tê pêkanîn, piştî pêkanînê, êdî wê xalên girêdayî mijara mafên siyasî, çand û zimanê Kurdî bên bicihkirin. Di nava mersûma 13’an de hatiye bibîrxistin ku wê di heftiyê de metryalên Kurdî li dibistanan bê dayîn, ew jî bi keyfî û bi bijartina Kurdan e, ango ne fermî ye, em tekez dikin ku ev yek nayê qebûlkirin. Ev 12 sal in ku şagirtên Kurd bi zimanê xwe li dibistanên Kurdî dixwînin. Di bingeh de nayê qebûlkirin ku zimanê Kurdî ne zimanekî fermî be mîna zimanê Erebî, mijara fermiyeta ziman mafekî rewa ye ji bo me Kurdan.”

### ‘Em pir şanaz in ku nakokî ji nava partiyan hatin rahiştin’

Hesîne destnîşan kir ku rewşenbîr pir serbilind in ku nakokî di navbera partiyên Kurdî de nema û wiha domand: “Gelê Kurd di êrişên dawî de gihabû qiraxa çiyayekî bilind û hindik mabû ku ber bi jêr ve bikeve. Me dît ku miletê Kurd li seranserî her sê parçeyan û cîhanê ji bo Rojava rabûn ser piyan û helwesteke bi tund dan nîşandan û gotin tunebûna Rojava nayê qebûlkirin. Di heman demê de me dît û hîna em dibînin ku helwesta yekrêziyê dane pêşiya helwesta partîtiyê. Gelê Kurd pir şadin ku yekîtî di navbera partiyên Kurdî de çêbû. Em rewşenbîr jî pir şanaz in ku nakokî di navbera partiyên Kurdî de hatin bidawîkirin, êdî rê nema li ber her kesî weke berê nêzîkbibe ku nakokî û fitneyê bixe navbera gelê Kurd û partiyên Kurdî. Ev helwesta yekrêziya Kurdî wê wiha bimîne û hêviya me ji partiyên me ew e ku li karê ji bo yekrêziya Kurdî weke bijankên çavên xwe miqate bin. Hem jî daxwaza me ji partiyên siyasî ew e ku bi hev re vê yekhelwestiyê biparêzin, hêviya me ev yek e, em ji wan bawer in û ew ê vê yekê pêkbînin.”

### ‘Pênûsa rewşenbîran çeka wan e, divê baş bi kar bînin’

Herî dawî helbestvan Hesîna Ehmed tekez kir ku pênûsa rewşenbîran mîna çekekê ye divê were bikaranîn û wiha bi lêv kir: “Em dibînin ku li ser mediya civakî şerekî pir dijwar li hemberî Kurdan tê kirin, şerê mediyayî û çapemeniyê tê kirin li ser Kurdan. Ji ber vê yekê em dibînin ku gotina rewşenbîran û pênûsa wan pir girîng e, ew helwestên wan weke guleyekê ne. Pênûsa rewşenbîran çeka wan in divê rewşenbîr baş bi kar bînin. Ez jineke rewşenbîr, nivîskar û helebestvan dema ku dibînim êriş tên li ser gelê Kurd, ez bersiva êrişan bi şêwazekî çewt û nebaş nadim, ez bi rêzgirtinê bersivê didim. Dema ku dijmin dixwaze me reş bike ez bi awayekî hurmetdarî bersva wan didim da ku ew vala derkevin. Bi vî awayî xebata warê rewşenbîrî didomînim da ku doza miletê Kurd bi rengekî şaristanî û mirovî ez bigihînim ji raya giştî û cîhanê tevî re.”



Ebdulkerîm Mûsa



Hesîna Ehmed



# Piştî çend salên hişkesaliyê careke din Çemê Xabûrê herikî

Piştî çend salan ji hişkesaliya Çemê Xabûrê, îsal ji ber zêdebûna barîna baranê asta avê di çem de bilind bûye û careke din av tê de bi rêjeya ku her çireyekê gihaşt 20 m3 tê herkandin.

**Lîloz Hisên/Qamişlo**

Piştî çend salan ji hişkesaliyê, Îsal ji ber barîna barana zêde li ava Çemê Xabûrê asta avê bilind bûye û careke din herikîna çem destpêkir. Di heman demê de li kantona Cizîrê bi giştî başbûneke berbiçav di asta avhewayî û çandiniyê de îsal hat nîşandan ku li praniya deverên kantonê bi rêjeya ji sedî 50'î baran lê bariya ye, ev baran bû alîkar di başkirina berdariya axê û bilindkirina asta şilbûnê di axên çandiniyê de, di heman demê de hilanîna ava sererd û binerdê. Li gorî pisporên di warê çavkaniyên avê de rêjeya herkîna avê di Çemê Xabûr de gihaşt 20m3 di her çireyekê de, ev yek jî zêdebûneke giring piştî demên dirêj ji hişkesaliyê de nîşan da.



**Çemê Xabûrê**

Çemê Xabûrê çemekî demsalî ye ku rasterast bi baranê ve girêdayî ye. Ew yek ji şaxên sereke yên Çemê Firatê ye ku ji Serêkaniyê derdikeve û bi qasî 320 km dirêj dibe.

**Bandorên erênî ya zêdebûna herikînê wiha ne:**

**Avdana bi awayê xwezayî ye**

Pisporên di warê çavkaniyên avê de destnîşan kirin ku bilindbûna asta Çemê Xabûrê ava zêde ji bo xakên çandiniyê peyda dike, bi taybet zeviyên Çile wekî ceh û genim ku dibe alîkar di xurtkirina mezinbûna şînatiyan û baştirkirina kalîteya berheman piştî demên hişkesaliyê.

**Bilindkirina ava binerdê**

Pisporên di warê çavkaniyên avê de dibêjin ku derbasbûna qedereke mezin ji avê di nava çem de dibe alîkar di hilanîna ava binerdê di deverên çandniyê de. Di heman demê de asta ava bîran jî baştir dike, bi taybet yên ku berê ji hişkesaliyê bi bandor bûne.

**Baştirkirina rewşa jîngehê**

Pisporên di warê çavkaniyên avê de tekez kirin ku herikîna birêkûpêk a çem piştgiriyê dide jîngeha herêmê, herwiha dibe alîkar disînordarkirina hişkesaliya berdewam a li ser herêmê.
Bilindbûna asta ava Çemê Xabûr dibe derfeteke erênî ji bo çandinî û jîngeha kantona Cizîrê, herwiha dibe alîkar di peydakirina çavkaniyên baştir ji bo avdanê û baştirkirina şilbûna axê. Di heman demê de piştgiriya ava binerdê ya nêzî çem dike û xwesipartina li ser pompekirina bîran kêm dike. Hebûna avê di çem de dibe alîkar ku demsala çandiniyê aram bibe û hilberîna çandiniyê baştir bike, nemaze li deverên nêzîkî çem.

**Bandora barîna baranê li ser demsala çandiniyê**

Barîna baranê bi awayekî erênî bandorê li ser demsala çandiniyê dike ku dikare tezmînatan bide beşek ji windahiyên salên borî ên çandiniyê û ji nû ve vejînkirina sektora çandiniyê. Nîşaneyên heyî nîşan didin ku kantona Cizîrê li ber qonaxeke nû ya vejîna çandiniyê ye, ji ber ku barana zêde û pêşkêşkirina piştgiriya ji bo cotkaran bi hev re dikare bibe derfeteke rastîn ji bo zêdekirina hilberîna herêmî, xurtkirina aramiya çandinî û aborî li herêmê. Li gorî agahiyên avhewayê ji destpêka demsala çandiniyê heta îro barîna baranê baş nîşan da ye ku bi cûdahiyên di navbera deverên kantonê de tê diyar kirin. Li hin deveran mîqdara baranê ya zêde hatiye tomarkirin û li hin deverên din jî rêjeya barîna baranê kêmtir hatiye dîtin.
Barîna baranê li piraniya deverên kantonê gihaştiye ji sedî 50'î ji rêjeya salên berê zêdetire.

# Heya niha mazot li 36 hezar û 511 malbatan hatiye belavkirin

**Jîn Hisên/Qamişlo**

**Belavkirina beşa duyemîn a mazotê berdewam dike, heya niha mazot li 36 hezar û 511 malbatan hatiye belavkirin û mîqdara ku hatiye belavkirin gihaştiye 7,302,200 milyon lître.**

Ji ber şert û mercên zehmet û dijwar û rewşa ku herêm tê re derbas dibe û ji bona pêkanîna pêdiviyên gel Rêveberiya Sotemeniyê biryar da ku careke din mazotê li gel belav bike. Ev biryara belavkirina Mazotê piştî nîqaşeke dirêj hat ragihandin, ku di serî de giringî bê dayî ji bo sektorên xizmetguzarî yên giştî wekî firneyên nan û hwd.. Proseya belavkirina mazotê bi awayekî rêxistinkirî di meha Hezêrana sala 2025'an hat destpêkirin, mekanîzmeya belavkirina mazotê xwesipartibû li ser kartên taybet û komînan, ji bo misogerkirina gihandina madeya mazotê ji malbatên hewcdar re bi awayekî rêk û pêk û dadperwer. Belavkirina mazotê heya meha kanûnê hat domandin, di nav de hemû malbatên ku li deverên kantonê hatibûn tomar kirin, ev yek di çarçoveya pilana ku armanca peydakirina pêwistiyên germkirinê di werzê çile de hat kirin, bi taybet di çarçoveya zehmetiyên aborî û jiyanî yên ku gel rêre derbasdibe.

**Ji ber rewşa dawî li herêmê biryarên nû hatin derxistin**

Ji ber pêşektin û geşedanên dawî di heman demê de şert û mercên ku herêm têre derbas dibe, biryarên ji nû ve belavkirina madeya mazotê li gorî giringiya wê hat girtin, di serî de hat tekez kirin li ser giringdayîna mazotê ji bo firneyan, ji ber rola wê ya bingehîn di peydakirina nan ji bo gel. Niha piraniya firne rojane 24 seatan dixebite, bi armanca dabînkirina pêdiviyên gel û ji bo misogeriya domandina xebitandina firneyan bê sekinandin mîqdara mazotê zêde bû.

**Ji bo jenetoran jî mazot hat dabînkirin**

Di heman demê de Rêveberiya Sotemeniya madeya mazotê li xwediyên jenetorên elktrîkê jî belav kir, ku ev yek rasterast zêdekirina xebitabndina Ampêran nîşan da herwiha hişt ku barê welatiyan sivik bibe bi taybet di çarçoveya kêmbûna pileya germahiyê de, di encamê de eletrîk ji 8 seatan gihaşt 12 seatan.
Giringdayîna belavkirina mazotê ji bo firne û jenetoran wekî gaveke demkî hat kirin, ji bo misogerkirina aramiya xizmetên sereke, heta ku şert û mercên guncav bên peyda kirin.

**Cara duyemîn a belavkirina mazotê**

Bi zêdebûna pileya sermayê ya dawî herwiha zêdebûna giliyên welatiyan li ser kêmbûna mazota germkirinê û hejmara zêde ya malbatan, daxwazên gel ji bo belavkirina beşa duyemîn a mazota germkirinê zêde bû. Ev daxwaz di nav Rêveberiya Sotemeniyê û saziyên peywendîdar de bi awayekî cidî hatin nîqaşkirin, ji ber vê yekê di dawî de biryarek hate dayîn ku belavkirina beşa duyemîn a mazota germkirinê bi bihayekî guncav bê belavkirin. Li gorî biryarê,



bihayê her lîtreyekê 1050 lîreya Sûrî hat destnîşankirin, da ku her malbatek 200 lître werbigre, tevahî bi nirxê 210 hezar lîreya Sûrî. Hêjayî gotinêye ku belavkirina mazota germkirinê bi rêya komîn û meclisên herêmî tê kirin, da ku bi awayekî rêxistinkirî bê berdewam kirin.

**Belavkirina mazotê berdewam e**

Belavkirina madeya mazotê beşa duyemîn di 28'ê Kanûnê de dest pê kir û li hemû deveran ji bajarê Dêrikê heta bajarê Til Temer digire nav xwe, bêyî ku sînorek ji bo hejmarên giştî were destnîşankirin. Armanc ew bû ku mazot bighêje her malbateke hewcedar li van deveran. Mekanîzmaya belavkirinê bi rêya meclis û komînan bi hevrêziya komîteyên sotemeniyê yên li bajaran pêk tê. Her malbatek 200 lîtreyan werdigire, herwiha bernameyek hatiye amadekirin ji bo tomarkirina daneyên malbatên ku sûd ji belavkirinê girtine. Hejmara malbatên sûd girtine gihaşt 36 hezar û 511 malbatan û mîqdara ku hatiye belavkirin 7,302,200 milyon lître bû.



# Gelê Kobanê 23 roj in li benda rakirina dorpeçê ne

Gelê Kobanê ku li hemberî çeteyên DAİŞ'ê bi berxwedaniya xwe mohra xwe li dîrokê xist, carekedin ji aliyê dagirkeran ve ji çar aliyan ve hatiye dorpeçkirin. Ev 23 roj in Kobanê di bin dorpêçeke giran ya êrişên çeteyên hikûmeta demkî û çeteyên dewleta Tirk de ne ku bi krîzeke mirovî re rû bir û ye. Li aliyê din bêdengiya sazî û rêxistinên navneteweyî hîştiye ku krîza mirovî girantir bibe.

**Navenda Nûçeyan**

Çeteyên girêdayê Hikûmeta Demkî ku di 6ê Çileyê de li dijî taxên Kurdan ên Helebê dest bi êrişan kir. Komên çekdar piştre jî li dijî bajar, navçe û gundên Rojava êrişeke berfireh dan destpêkirin. Li dijî êrişan Rêveberiya Xweser a Rojava banga seferberiyê kir. Piştî banga Rêveberiya Xweser li çar aliyên Kurdistanê û derveyî welat gelê Kurd û dostên Kurdan rabûn ser pêyan û nêzî meheke ku gel li qadan in. Rêber Apo ji bo rawestandina êrişan û pêkhatina agirbestê ket nava heweldanê. Berxwedana gelê Kurd, Hikûmeta Demkî ango HTŞ'ê neçarî peymanek nû ya agirbestê kir. Ji bo bi dawîbûna şer û pêkanîna entegrasyonê di 29'yê Çile de bi navbenkariya Amerîka û Fransayê peymanek hate îmzekirin. Rûxmê lihevkirinê, hê jî ambargoya li ser Kobanê û gundewarên wî didome.

**Kobanê ji çar aliyan ve hatiye dorpêç kirin**

Kobanê ya ku bûye sembola berxwedaniyê ji çar aliyan ve hatiye dorpêçkirin Rûxmê diyalog û lihevkirinan jî heta niha ambargoya ser Kobanê bi dawî nebûye. Nifûsa Kobanê nêzî 200-250 hezare. Nêzîkî 350-400 hezar koşçber ji Efrîn, Heleb, Reqa, Tebqa û derdorî Kobanê jî koçî nava bajar kirine. Di nava dorpêç û bêderfetiyê de gel li ber xwe didin. Xwendin li Kobanê sekiniye. Niha 72 hezar xwendevan ji xwendinê bêparin. Dîsa 3 hezar mamoste nikarin ders bidin. Ji ber ku koçber piranî li nava dibistanan hatine bicihkirin.Li aliyê din dorpêçeke jiyanî hatiye danîn. Xetên înternetê û telefon jî hatine birîn. Xeta înternetê ya ku ji Sirînê diçe Kobanê. Ev jî ji aliyê çeteyan ve hatiye qûtkirin. Di 29'ê Çileyê de bi navbeynkariya Amerîka û Firansayê peymanek ku ji 14'e xalan pêk dihat ji aliyê hêzên sûriya Demokratik û Hikûmeta Demkî ve hat imzekirin. Yek ji xalên peymanê jî rakirina ambargoya li ser kobanê û gundewarên wî bû, pêwistiyên esasî yên jiyanê yên mîna elektirîk, internet, mazot, av û derman nemane. Ev jî dide ispatkirin ku Hikûmeta Demkî di pêkanîna peymanê de ne cîdiye. Kobanê ya ku bi berxwedani ya xwe di Cîhanê de deng veda, hêzên hegemon ji bo ku serweriya xwe pêk bînin dako berxwedaniyê têk bibin çar aliyan de dorpêç kirine. Gelê kobanê wê xeyalên wan têk bibin. Ev rewş û domandina ambargoya li ser Kobanê edî fikaran di nav gel de dide çêkirin.

**Kompoloya navnetewî wê îradeya gel neşkîne**

Ev êrişên li ser Rojava encama komployeke navneteweyî ye ku dixwazin netewa demokratîk tine bikin.Ji destpêka êrîşan heta niha gelê Kobanê bi îrade û vîneke xort li berxwe dide. Ev 23 rojin ku di bin dorpeçê de ne, Deriyên sînor girtî ne. Heta çend roj berê jî êriş hebûn. Hewldanên wan ên dagirkirina gundan hebûn. Lê ew demeke ku êriş rawestiyanê û bêdengiyek heye. Lê rewşa



welatiyên di bin anbargoyê de pir zahmet e. Taybet qût kirina kehrebe, av û pêdiviyên bingehîn ên jiyanî, derman û nederbaskirina alîkariyê aloziyeke mezin derxistiye. Taybet welatiyên nexweş ku rewşawan nebaşe, bi zehmiyetan re rû bi rû ne. Her wiha welatiyên nexweşiya wan a oksîjenê heye jî pir zahmetî dikşînin ji ber nebûna kehrebeyê. Dermanên heyî têra nexweşiyên welatiyên Kobanê nake. Xwarin û vevxwarin jî hinek alîkarî hatin. Lê gel ne mûxtacê xwerin û vexwarinê ye Kobanê li ber krîzeke mezin ya mirovî rê rû bi rû ye, 21 tirên alikariyê ku ji Bakûrê Kurdistanê hat şandin ji aliyê dewleta Tirk ve hat rawestandin. Nehiştin ku alîkariyên mirovî bigihêje xelkê bajar. Li aliyê din pêwîstiyên jiyanî pir kêmin û bi rêya hinek saziyan bi sînordarî alîkarî gihiştiye Kobanê û ew jî têrê nake. Alîkariyên ku hatin şandin jî di nav wan de jî tiştên pêdiviyên malbatê pêk binin nedihatin peydakirin. Tişta ku here zêde pêdîvî pê heye derman û şîrê zarokane.

**Ji 18'ê Çileyê ve heta niha tenê 30 deqe elektirîk ji bo Kobanê hatiye berdan**

Piştê dagirkirina Heleb û Sirînê Elektirîk (kehrebe) jî ji navçeya Sirîn ku dihat kobanê. Ji ber Sirîn di bin kontrola çeteyên Hikûmeta Demkî ya Sûriyeyê de ne. Ji 18'ê Çileyê ve heta niha tenê 30 deqe elektirîk ji bo Kobanê hatiye berdan. Nexweşxaneyên li Kobanê bi alîkariya matoran kar dike. Mazota matoran jî ber bi dawî ve diçe. Ji ber ku ew jî ji derveyî Kobanê dihat. Li aliyê din jî çeteyan ava vexwarinê li ser Kobanê biriye. Ava vexwarinê ya ji bo Kobanê ji Çemê Firatê tê û 15 trûbînên avê hene ku hemû jî bi elektirîkê kar dikin. Ji ber qûtkirina elektirîkê av jî qût bûye.Niha xelkê Kobanê pêwîstiyên xwe yên avê ji bîran pêşwazî dike. Ava bîran ne têra gelê Kobanê û ne jî koçberan dike. Li aliyê din ji ber ava bîran rêjeya nexweşiyê jî li wir zêdetir bûye.

# Yekîtiya gelê Kurd wê zordariya zaliman bişkîne

**Leyla Amûdê**

Gelê Kurd di nav çar dewletan de, li ser xaka xwe hatiye dagirkirin. Welatê wan hatiye parçekirin. Li her cihê lê rastî zilm û zordariyê hatine. Hîn jî heman rê û rêbazên zext, zordarî, koçberî, lêdan, qewitandin, girtin, înkar û qirkirinê li ser wan tên pêkanîn. Weke Kurdên nifşên vê demê em jî rastî her tiştên me bihîstibûn û xwendibûn ku hatine serê dapîr û bapîrên me, hatin. Ti gel, civak û ferd bi qasî Kurdan rastî xiyanet, komkujî, sirgûn û êrîşa nehatine.
Dema komkujî û qirkirinên gelên weke Cihû, Ermenî û hwd. bi dawî bûn, dewlet û saziyên curbicur ketin nav tevgerê. Hat qebûlkirin ku li hember wan gelan qirkirin çêbûne. Hate diyarkirin ku ya li hember wan gelan hatiye kirin neheqî û dijmintî bû. Ermenî û Cihû piştre bûn xwedî dewlet. Lê ji bo gelê Kurd ê di roja me de nifûsa wan gihiştiye 60 milyonî û hê jî rastî gelek êrîş û komkujiyan tên ji bo di nav sînorên dewletên heyî de karibin bi ziman û çanda xwe bijîn jî ti heq û maf rewa nayê dîtin. Kes nabêje, "Ew gel bi salan e rastî qirkirinan tên, bila êrîş û zextên li ser wan rawestin. Divê Kurd karibin xwe bi xwe bi rê ve bibin."
Tevî hemû astengî û zilmê jî bi têkoşîna di pêşengiya Rêber Apo de, bi ked û fedakariya bi hezaran şehîd û birîndaran gelê Kurd hebûna xwe da qebûlkirin. Dîsa ligel hemû hişmendiyên biçûkxistin, înkar û îmhayê jî Kurd destê xwişk û biratiyê dirêjî gelan dikin. Kurd dixwazin jiyaneke bêzext, bêzilm a li ser esasê azadî, wekhevî pêk were. Ev bêguman ji esalet, pakî, duristiya Kurdan tê.
Em pirs bikin gelo sedema xwe çi ye ku dewletên mezin û navendî li hember Kurdan êrîş û komkujiyan erê dikin? Ez bawer im her kes dizane bê sedemên wê çi ne. Çawa hin sedem servekirî ne, tekez hin sedem jî sergirtî ne. Mirov dikare wan sedemên sergirtî jî bi lêhûrbûn û lêkolînan derxîne zanebûnê.
Kurdan bi salan hişê xwe bi kar neanîn. Tenê bi hest û hêza xwe ya bedenî kar dikirin. Ev jî dibû sedema werin lîstikên xelkê. Di encama her serhildan û rabûnên bi vî rengî de rastî komkujiyên mezin hatin û bi salan nikarîn bi ser hêza xwe ve werin. Her kesî jî Kurd ji bo xwe weke hêzeke amade didît. Di şer û pevçûnan de ew didan refên herî pêş. Bi salan li hember gelan siyaseta parçe bike û bi rê ve hat pêşxistin. Ereb kirin 22 dewlet. Lê ev rastiyeke ku yên herî zêde zerar ji vê polîtîkayê dîtin gelê Kurd bû.
Yek ji sedema din a kes li hember êrîşên li ser Kurdan dengê xwe nake û erê dike jî bi serdemên dîrokî ve girêdayî ne. Pêşengê dewleta Eyubî Selaheddînê Kurdî ku li Rojhilata Navîn li hember Xaçperestan ket nav berxwedaneke mezin, ev mijar hê ji aliyê hêz û dewletên Rojavayî ve nehatiye jibîrkirin. Ew dewletên dirinde û navendî yên Ewropayê hîn wê kîn û dijmintiyê li hemberî neteweya Kurd bimeşînin û dixwazin tola xwe ji wan rakin.
Sedema herî bingehîn jî ew e ku gelê Kurd serê xwe ji neyar û zaliman re qet netewandiye. Timî sade û pak maye. Me weke netewe siyaset weke derew û nifaq dizanî. Me wiha fikir dikir ku siyaset aîdî dewletê ye û divê em xwe têkelî wê siyaseta qirêj nekin. Lê piştre Rêbertiya me derket ser dika dîrokê bi têkoşîna xwe ya 53 salan em serwext û zanakirin. Gelê Kurd xwe bi fikir û felsefeya Rêbertî re kir yek. Me fêm kir ku ew tiştên berê me xwe ji wan dûr dixist ji me re pêwîst in.
Dema li hember Rojavayê Kurdistanê êrîş û gef çêbûn Rêber Apo peyam şand û diyar kir ku divê Kurd xwedî li hev derkevin, sînoran nas nekin û bi yekîtiyê hevdu biparêzin.
Dema êrîş li ser hêzên QSD'ê giran bûn gelê Rojava rabû ser piyan. Hema li dû wê Kurdên li Bakur, Başûr û Rojhilat ketin nav tevgerê. Ciwanên Nisêbînê sînorên dagirkeran rakirin û berê xwe dan binxetê. Dîsa ji Başûr bi dehan ciwan tevlî seferberiya ji hêla Rêveberiya Xweser ve hat ragihandin bûn. Li Ewropayê û deverên din ên cîhanê Kurd û dostên wan bi rojane bi çalakî, meş û xwepêşandanan piştgiriya xwe ya bi gelê Rojava re nîşan dide. Ciwanê Başûrê Kurdistanê Ehmed Kerkukî li xaka Rojava di berxwedana rûmetê de gihişt şehadetê û bû sembola yekîtiya neteweyî ya Kurd.
Ez careke din dibêjim ji derveyî gelê me ti kes, li me xwedî derneket. Hewce nake em careke din ji xwe re serdar û efendiyan çêbikin. Em xwedî fermandar û şervanên weke Ziyad Heleb, Deniz, Rojbîn, Dilbirîn, Amara, Hewar, Stêra, Sîdar û sedan qehremanên wiha ne. Wan hevrêyan di eniyên şer de heya nefesa xwe ya dawiyê de şer kirin û gihiştin şehadetê. Ew in serkêş û qehremanên me. Ew in lehengên mîna çiyayan bi hêz in ku em di rêya wan de bimeşin.
Careke din ez bi hurmet û minetdarî tevahî şehîdên me yên azadiyê bi bîr tînim û soza xwe, ji wan re nû dikim. Em weke gelê Kurd bi ked û têkoşîna Rêber Apo, serwext û zana bûn. Hewce ye li ser vî esasî em hê zêdetir xwedî li hev derdikevin. Bi vî rengî tekez wê serkeftin ya Kurdan be. Her wiha divê em weke gel li hemberî lîstik û planên kirêt jî hişyar bin û ji berxwedana xwe tawîzan nedin. Yekîtî û hevgirtina gelê Kurd wê zordariya zaliman bişikîne û wan teqez têk bibe.

## Pêvajoya Aştiyê û komploya li ser Rojava

**E.Pêjder Altan**

Rojhilata Navîn, piştî hilweşîna Bloka Sovyetê heya roja me ya îro, weke qada sereke ya Şerê Cîhanê yê Sêyemîn, şahidiyê ji guherînên hevsengiyên siyasî yên kûr re dike. Di vê pêvajoya ku hêzên global û herêmî ji bo xurtkirina pozîsyonên xwe di nava têkoşîneke dijwar de ne, du geşedanên krîtîk derdikevin pêş: Înîsiyatîfa Rêber Apo ji bo çareseriya demokratîk a pirsgirêka Kurd li Tirkiyeyê û komploya navneteweyî ya ku bi êrîşan li dijî Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê tê meşandin. Analîzeke rast a van her du pêvajoyan nîşan dide ku ew ne tenê bi hev ve girêdayî ne, di heman demê de encamên rasterast ên polîtîkayên hegemonyayê yên li ser enerjî û kontrola jeopolîtîk in.
Kapîtalîzma global a ku weke "cinawirekî enerjiyê" tevdigere, Rojhilata Navîn kiriye navenda pevçûnên xwe. Di vê çarçoveyê de, tifaqa di bin pêşengiya DYA'yê de ku bi "Peymana Brahîmî" hatibû xurtkirin û projeya "rêya enerjiyê" ya ji Hindistanê heya Ewropayê, Tirkiyeya ku xwe weke korîdoreke stratejîk didît, xiste nava xofeke mezin a îzolebûnê. Balkêş e ku êrîşa Hemasê ya 7'ê Cotmehê, tam piştî van biryarên stratejîk pêk hat. Ev êrîş ku tê îdiakirin bi teşwîqa Tirkiyeya ji hevsengiyên nû nerazî pêk hatiye, bû hincet ku Îsraîl bi piştgiriya hêzên rojavayî, Rojhilata Navîn li gorî berjewendiyên xwe ji nû ve dîzayn bike. Bi perçiqandina Hamas û Hizbullahê û anîna HTŞ'ê ya ser desthilata Şamê, ne tenê derbe li Îranê hat xistin, di heman demê de zemîn ji bo sîstemeke otorîter a ku li dijî her cure pêşketina demokratîk e, hat amadekirin. Gotina nûnerên DYA'yê ku "ji bo Rojhilata Navîn şêwaza herî baş monarşî ye", niyeta rastîn a modernîteya kapîtalîst eşkere dike: Ew li herêmê ne çareseriyeke demokratîk, sîstemên ku di bin kontrola wan de bin dixwazin.
Di konjonktûreke wiha de ku dewleta Tirk hem di warê siyaseta derve de tengav bûye, hem jî di şerê xwe yê taybet ê li dijî Tevgera Azadiyê de negihîştiye encamê, banga Devlet Bahçelî ji bo Rêber Apo weke îtîrafeke lawaziyê derket holê. Rêber Apo, bi kûrbûneke stratejîk ev firsend dît û bi gotina "hêza min heye ku vê rewşa pevçûnê bikişînim zemîneke siyasî û hiqûqî" însiyatîf girt destê xwe.
Armanca sereke ya Rêber Apo ne tenê çareserkirina pirsgirêka Kurd, bi riya demokratîkbûna Tirkiyeyê, vekirina rê li ber demokratîkbûna tevahiya Rojhilata Navîn e. Ev stratejî li ser têkiliya diyalektîk a di navbera çareseriya pirsgirêka Kurd û demokratîkbûna Tirkiyeyê de ava bûye. Li dijî zîhniyeta dewletê ya ku dibêje "heke demokrasî pêş bikeve, wê Kurd jê sûdê werbigirin, lewma divê em li dijî demokrasiyê bin", Rêber Apo israr dike ku têkoşîna ji bo demokratîkbûna Tirkiyeyê, di heman demê de têkoşîna herî bi wate ya ji bo çareseriya pirsgirêka Kurd e.
Tam di demekê de ku Rêber Apo ji bo pêşîgirtina li pevçûnan û pêşxistina entegrasyoneke demokratîk li Sûriyeyê jî ketibû dewrê û bi nameyan perspektîf dida rêveberiya Rojavayê Kurdistanê, êrîşên li ser Şêxmeqsûd û Eşrefiyê dest pê kirin. Ev êrîş ku weke komployeke navneteweyî (Peymana Parîsê) di navbera DYA, Îsraîl, Tirkiye û Şamê de hat plankirin, rasterast mudaxeleya Rêber Apo a ji bo çareseriyê hedef girt. Paradîgmaya Rêber Apo a li ser bingeha "neteweya demokratîk, ekolojî û azadiya jinê" ku li Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê bûbû modelek, weke havênê demokratîkbûnê li tevahiya herêmê belav dibû. Şoreşa "Jin, Jiyan, Azadî" li Îranê û bandora vê modelê li Iraq û Tirkiyeyê, hêzên hegemonîk tirsandin. Ji ber ku projeya Rojava, alternatîfeke li dijî sîstema dewlet-netewe ya otorîter û kaosê pêşkêş dikir. Lewma, hêzên navneteweyî û dewleta Tirk ku pêşketina demokrasiyê weke xetereya herî mezin li ser berjewendiyên xwe dibînin, bi hevkariyeke qirêj êrîşî vê destkeftiyê kirin. Tirkiye, di berdêla teslîmbûna xwe ya ji polîtîkayên DYA û Îsraîlê re, li ser bingeha tasfiyekirina statuya Kurdan, "ronahiya kesk" ji bo êrîşan wergirt.
Geşedanên heyî bi awayekî tund hişyariyê dide ku pêvajoyên "aştî" û "bêçalakîtiyê" ne weke demên sekinandinê, divê weke qonaxên têkoşîna siyasî ya piralî werin nirxandin. Rêber Apo bi xwe jî diyar dike ku ev pêvajo ne "bazara li Îmraliyê" ye, têkoşîneke siyasî ya "herî zirav û kûr" e. Ji bo ku hewldanên wî bigihîjin encamê, pêwîstî bi têkoşîneke rêxistinkirî ya gel a bênavber heye. Sistbûn û ketina nava bendewariyê, xefleta herî mezin e.

# ‘Çima Kurd wekî Cihoyan nikarin kongrekê li dar bixin?’

Şîrovekarê siyasî Pîr Rustem diyar kir ku armanc ji êrişan ew bû ku Ehmed Elşeri xwe di çavê murûdê xwe de hêzdar bide nîşandan û got, “Berxwedaniya gelê Kurd li Rojava, hem jî destekdayîna Kurdan li tevahiya Kurdistanê û derveyî wê hişt Şam û hêzên navdewletî li hesabê xwe vegerin. Ji bo parastina destkefitiyên Kurdan çima kongereyeke niştîmanî mîna Cihoyan nayê lidarxistin.?"

**Hemze Sevo**

Berxwedana Rojava ya li dijî êrişên hikumeta demkî, hem yekrêziya Kurdî û destekdayîna gelê Kurd ji bo doza Kurdî li ser asta cîhanê rojeva herî berbiçav û girîng bû ku bala raya giştî ya cîhanê kişand. Derbarê heman mijarên derbasbûyî de şîrovekarê siyasî yê Kurd Pîr Rustem bersiva pirsên rojnameya me da û hevpeyvîn wiha bû:

**- Armanca hêzên navdewletî ji êrişa li ser Rojava çi bû, gelo armanca wan pêkhat?**

Bi dîtina min; bêtirî armancek wan ji vê êrişê hebû, ji aliyekî ve wan xwest ku desthlatiya Şamê li ber çavên mirûdên wê weke desthlatiya dikare destê xwe deyne ser hemû nexşeya Sûriyê, ango xwestin Ehmed Elşeri serokê Sûriyê weke kesekî xwedî hêz û biryar li pêş mirûdên xwe û hemû xelkê Sûriyê werê nîşandan, ew ji aliyekî ve û ji aliyê din ve jî xwestin Tirkiyê hinekî bi razî bikin û bêjin vayê me ew herêmin di destên HSD’ê û Rêveberiya Xweser de me nehişt û bi wê yekê xelkên Ereb ên wan herêman bi razî bikin. Ji ber em bixwazin nexwazin meraq û hestên xelkê wan deverên Ereb, weke Dêrazorê û Reqayê dê bi desthilatiya Şamê re be û ne HSD’ê û Rêveberiya Xweser, ne ji ber sembola “Biratiya Gelan” şaş û çewt e, wek hinek camêr dixwazin bi me bidin fêmkirin, ne ji ber ku civaka me ya Rojhilata Navîn hîna di raman û baweriyên êl û eşîrtiyê de dîlkirî ye, yan civakek li paşmayî ye û ne gihîştiye wê radeya şaristaniya ku welatekî azad û demokrat ava bike. Mixabin hîna ji civakên me yê Rojhilat bi dem gerek e ji wê paşmayîna xwe derkeve û civakeke netewî û ne nijadperestî, weke yên li welatên me, ava bike. Bi dîtina min ev bû armanca hêzên navdewletî ji wê êrişa ku hinekî dilê wan hêzên li Şamê û di pişt wan re dilê Tirkiyê jî hinekî rihet bike ku ti bivetiya



HSD’ê û Rêveberiya Xweser li ser wan nema!

**-Hûn vê berxwedaniya ku ji hêla gelê Kurd ve li Rojava tê kirin, çawa dinirxînin û vê têkoşînê çi encam bi xwe re anîn?**

Helbet berxwedaniya gelê me cihê serfirazî û serbilindiya her Kurdekiye û ne tenê di vê dema dawî de, erê rast e di van demên dawî de xelkê me bi tevayî rabûye ser piyan û berxwedaniyek bêhempa li hember dijmin û çetiyên ku xwestin miletê me qirbikin da meşandin û hişt ne tenê Şam û Enqerê lêvegerînê ji hesabên xwe re bikin, belê heya hiştin ku hikumet û welatên navdewletî jî li xwe û pirojeyên xwe vegerin û bi çavekî nuh li Kurdan û doseya Rojavayê Kurdistanê binêrin, em dikarin bêjin ku berxwedaniya gelê me hişt doza Kurdî li tevahî perçeyê Kurdistan têkeve asteke bilind û helbet ev berxwedanî xelekeke ji berxwedaniya miletê me di van salên dirêj de ji temenê şerê di hundirê Sûriyê de û piştî dayîna bi hezaran qurbanî ku keç û xortên me xwîna xwe di vê riya pîroz dan xaka Kurdistanê. Vaye li dawiyê miletê me karî hin destkevtên bilind bi destbixin û em dikarin bêjin ku ev kar û xebata miletê me li Rojava hişt gelek encam werin bi dest xistin; ya herî pêşîn, hişt Kurd û belkî cara yekem di dîroka me de bibin yek û bi yek dengî piştevaniya Rojava bikin, ne tenê di asta civakî û gelêrî de, belê heya di asta siyasî û partiyên me de jî ku me dît hemû hêz û partiyên me piştvaniya doza Kurdî li Rojava dikin! Xal an encama duyemîn, gelê me hişt Şam û piştgirên wê mecbûr bibin ku mafên Kurda qebûl bikin, erê belkî ne temamî bi dilê me be, lê heya astekê baş ew maf bi destê gelê me ketin û hîne encama herî balkêş ji berxwedaniya gel hişt ku hêzên navdewletî û hin sinatorên Emerîkî dengên xwe bilind bikin û daxwaza gelê Kurd li Rojava û herêmê bixwazin. Ango miletê me bi vê ked û berxwedaniya xwe ya bilind hişt cara yekem doza Kurdî li Rojava têkeve asta dozeke navdewletî û ew mecbûr bibin li çareseriyan bigerin û mafê Kurdan qebûl bikin.

**-Destekdayîna Kurdan li seranserî Kurdistan û diyasporayê ji bo Rojava xwedî wateyeke çawa bû û li hemberî êrişên qirkirinê çi kar li ser asta saziyên navdewletî hat kirin?**

Weke di pirsa çûyî de me anîbû ziman ku yek ji encamên sereke ji xebata miletê me, çi ên li hundirê Rojava an li perçeyên Kurdistanê yên dîtir an jî heya miletê me yên li derveyî Kurdistan, ên li welatên Ewrupa û koçberiyê û derketina wan ya ser piyan ji bo destekdayîna birayên xwe yên li Rojava hişt ew paytextên dixwestin Kurda qirbikin, weke Enqera, li hesabên xwe vegerin û metirsiyên mezin ji hikumetên wan re çêbikin, nemaze derketina Kurdên me yên Bakur xala dîtir hişt hêzên navdewletî jî careke din li doza Kurdî xwedî derkevin, nemaze hin sînator weke birêz Lîndisî Giraham û ji bilî wî xwe bidin pêş û guftûgoya bi destlatiya Şamê çêkirin û daxwaz ji wan û çeteyên wan û li pişt wan jî hin paytext weke Riyad û Enqerê ku rê li ber çeteyên xwe bigrin, an jî dê herin projeya parastina gelê Kurd û bi kutekî û darêzorê. Lê ji hemû tiştî bilindtir ev tevgera yekbûna Kurda li hemû deveran bi hev re û bi yek dengî û yek hestî hişt coş û kelecana Kurdan bilind bibe û ev yeka destkeftiya herî mezine bo gel û doza me Kurdan û dê bibe bingeha her xebateke Kurdan li seranserî perçeyên Kurdistanê bo azadî û serfiraziyê gelê kurd!

**-Da ku gelê Kurd li Rojava û parçeyên din ên Kurdistanê ji qirkirinê were parastin û mafê wan misoger bibe, pêwîste partiyên Kurdî, tevahiya gelê Kurd, kesayetên xwedî rol di asta navdewletî de çi xebatê bidin meşandin?**

Helbet ji parastina gelê me û bi destxistinên mafê vî gelî, divê gelek xebatên birêkûpêk werin kirin û di destpêkê de, divê partiyên me, dezgehên mafên mirovan, sivîl, kesên rewşenbîr û xwedî rolên ciakî ên Kurd karibin li hev kombibin û kongireya netewî lidarbixin. Cihoyan karîbûn berî bêtirî sed salî kongirê xwe yê yekemîn li welatê Siwêsra bidana damezrandin, vêca çima em Kurd piştî wan bi sed salî nikarin kongirekî wiha ji bo miletê xwe li dar bixin. Li aliyekî din ji me tevan tê xwestin û bêtir ji siyasetmedar û kesên rewşenbîr ku bi erk û rola xwe rabin, çi di hundir civaka Kurdî ji bo çandina girêdana bi doza Kurdî ku ew girêdan û hizra herî bilin û pêşî be. Pêwîste ku ne meseleyên êlî yan jî partîtî û eşîrtî, careke din divê tevgera me teva bi hêz û birêkûpêk di nav civaka navdewletî de; ango divê karekî dîblomasî xurt werê meşandin û di vî alî de jî divê Tevgera Siyasî ya Kurd alîkariya nifşên nuh bide ber çavên xwe, bi taybet evên ku îro di civaka Europayê de mezin dibin û di dibistan û zanîngehên wê de tên perwerdekirin, dê karbin karên diblomasî bi rengekî rêkûpêk bidin meşandin. Ev yek dê bihêle ku em careke din xwesteka damezrandina Lobiyekî Kurdî bixwezin ku karibe bandorê li navendên xwedî biryar li wan welatan bike. Eger em karibin van xalên sereke pêkbînin, dê doza miletê me li herçar perçeyên Kurdistanê bi leztir serbikeve.



## Garantiya sereke xweparastina gel e!

**Dilyar Cizîrî**

Di 6’ê meha Çile de û piştî civîna li Parîsê ya di navbera Îsraîl û hikûmeta demkî ya Sûriyê li dijî taxên Şêxmeqsûd û Eşrefiyê yên Helebê êrişeke berfireh hate destpêkirin. Êriş bi navê Artêşa Sûriyê bû, lê yên serkêşiya wê dikirin, dewleta Tirk, çeteyên wê û bermahiyên DAIŞ’ê li gel çekdarên hikûmeta demkî êriş pêk anîn. Hêzên navdewletî, welatên ereb û heta endamên Koalîsyona navdewletî cihê xwe di êrişê de girtin.
Tevî êrişa dijwar di taxa Şêxmeqsûd de berxwedanek bêhempa hate nîşandan. Di wir de Şehîd Ziyad Heleb û hevalên xwe dîroka berxwedana serdemê nûjen kir. Dewleta Tirk û çeteyên wê di Helebê de sînordar neman, li Dêrhafir û herêmên din êrişên berfireh pêk anî. Di encamê de hêzên QSD’ê ji bo komujî pêk neyên û şer veneguhere Şerê kurd-ereb, hêzên xwe vekişand. Ji ber li kêleka êrişên çekdarî şerekî ragihandinê ya ne normal a bi fînaseya dewletên wekî Erebistana Siûdî û Qeterê pêk hat.
Plana li dijî Rojava piralî û qirêj bû. Armanca dewleta Tirk bi vê planê ew bû di herêmê de şerê kurd û ereban mezin bike. Ew jî di aliyê xwe de li ser hesabê herdû netewan qezencan bi dest bixe. Lê plana wan heta niha pêk nehat û encam ne girt. Dewleta Tirk û hikûmeta demkî ya HTŞ’ê heta niha hemû plan û sozên xwe binpê dike. Ev bê soziya wan diyar dike. Di encama êrişê de bi hezaran çeteyên DAIŞ’ê ji girtîgehên Şedadê, Reqa û Kampa Holê derxistin û di nava Artêşa Sûriyê de bi cih kirin. Tişta sosret jî bi hezaran DAIŞ’yî yên wekî şaneyên razayî tevdigeriyan, hişyar kirin û ew jî bi cilên leşkerî fermî kirin.
Piştî şerê dijwar û êrişên hovane di navbera QSD’ê û hêzên hikûmeta demkî ya Sûriyê de peymana 29’ê Çile hate imzekirin. Di pêkanîna xalên peymanê de heta niha QSD’ê û Rêveberiya Xweser li pey hev gavan davêje. Hêzên ewlekariyê yên hikûmeta demikî hatin Hesekê û Qamişlo û şandeyên wan li Rimêlan û Siwêdiyê geriyan. Tevî hemû gavan hikûmeta demikî ya Sûriyê û dewleta Tirk gavan navêje. Ne koçberên Efrîn û Serêkaniyê vegeriyane warê xwe. Ne jî ava Hesekê û Til Temirê ku piştî dagirkirina Serêkaniyê hatiye qutkirin, hate berdan. Ne rê hatine vekirin.
Pêre jî hîn alavên wan ên kîndarî û derxistina nakokiyan dewam dike. Dewleta Tirk jî dibêje tevî peymanan û entegrasyona QSD’ê di nava Sûriyê de ew ê hêzên xwe ji Sûriyê venekşînin. Di encam de û tevî aliyên garantor hene, di pêkanînê de garantiya sereke hêza gelê herêmê ye.
Bi wate çiqasî itîfaq pêk werin û çiqasî gav werin avêtin jî divê gelê kurd li Rojava dûrî banga seferberiyê ya Rêvreberiya Xweser û QSD’ê nekevin. Peyman bi aliyên bê soz re têne kirin û ev jî metirsiyê daha zêdetir dike. Lê tişta hêvî û baweriyê dide mayîna hêza QSD’ê bi taybetmendiya xwe, ya duyemîn yekîtiya gelê kurd a li dora Rojava ye. Îcar çi dibe bela bibe, divê gel herêmê heta dawiyê di parastina tax û bajarên xwe de seferber bin.



# Weqfa Jina Azad: Ji bo parastin û tenduristiya koçberan em ê her tim alîkar bin

Rêveberiya Weqfa Jina Azad ya beşa tenduristiyê Melka Hesaf da diyarkirin ku ew ji bo parastina tenduristiyê bi Koçberan re alîkar in û got, “Heya ku em karibin em ê bi koçberan re alîkar bin.”

**Solîn Mihemed/ Qamişlo**

Weqfa Jina Azad ji bo parastina tenduristiyê bi koçberan re alîkarin. Herwiha Weqfa Jina Azad jî pênc klînîk li bajarên Dêrik, Hesekê, Qamişlo, Dirbêsiyê û Kobanê, ji bo koçberên li wir belav kirin e. Di heman demê de jî dermanên pêwîst ji bona koçberan pêşkêş dike.
Di derbarê mijarê de rêveberiya Weqfa Jina Azad ya beşa tenduristiyê Melka Hesaf ji Rojnameya me re axivî.

**‘Em jî wek parastina tenduristiyê bi koçberan re alîkar bûn’**

Melka diyar kir ku ji destpêka ku koçber hatine ew wek parastina tenduristiyê bi wan re alîkar in û wiha got: “Ji destpêka ku ev koçber hatine em di tevgerê de ne. Em dixwazin hertim bi wan re alîkar bin, ji ber ku ev koçber bû cara çaran ku ji cih û warên xwe koçber dibin. Em jî wek parastina tenduristiyê bi koçberan re alîkar bûn û me derman ji wan re pêşkêş dikirin. Gelek ji koçberan nexweş bûn û di sermayê de gelek cûreyên nexweşiyan jî bi wan re derketibûn, ji ber vê yekê em li wan geriyan û li gor nexweşiyên wan me derman belav kir. Ji xwe em derbasî pênc dibistanên koçberan bûn û di her dibistanekê de zêdeyî sed mirovî jin, mêr û zarok me derman da wan. Herwiha jî gelek kesên din jî alîkariya koçberan di hemû warî de dikin.”

**‘Heya ku em bikaribin em ê alîkariya koçberan bikin’**

Melka Hesaf anî ziman ku heya ji wan were wê alîkariyê bi koçberan re bikin û wiha berdewam kir:”Em jî wek rêxistinekê me alîkariya dermanan ji koçberan re pêşkêş kir. Ji xwe me li gelek dibistanan derman belav kir û em ê van alîkariyan jî berdewam bikin. Di heman demê de destwerdana me ya tenduristî û piskolojîk li stargehên li gelek bajaran, bi rêya klînkan, wesayetên bijîşkî yên mobîl û komîteyên mobîl, me zêde kirin. Dermanên me jî belavkirina kirêmên dermanî, vîtamîn, şerbet û dermanên ji bo dermankirina serma û grîpê dihewîne.”

**‘Dermanên me kêm dibin ji ber ku koçber pirin’**

Melka di dawiya axaftina xwe de bal kişand li ser dermanan û wiha got:” Me pênc klînîk li bajarên Dêrik, Hesekê, Qamişlo, Dirbêsiyê û Kobanê belavkirin û herwiha wesayîteke bijîşkî ya gerok a herêma Dêrikê jî hatiye aktîfkirin, bi armanca gihîştina hejma-



reke mezin ji koçberan. Herwiha em carnan bi alîkariya saziyan dermanan belav dikin û hem jî carnan em bi xwe jî dermanan dikirin û belav dikin. Di warê kêmbûna dermanan de, em bi Heyva Sor a Kurd re diaxivin da ku dermanên pêwîst ji me re peydabikin. Lê niha zehmetiyên me hinekî ji aliyê peydakirina dermanan de derdikeve hole; ji ber ku koçber pirin û hin beşên dermanan li ba me kêmin, lê emê hewil bidin ku dermanên pêwîst ji bona koçberan peydabikin”.

# Tevî zor û zehmetiyan karê Şaredariya Gel a Qamişlo berdewam e

**Roheyv Keleş/ Qamişlo**

**Tevî rewşên dijwar ên ku kantona Cizîrê tê re derbas dibe û barên xizmetguzariyê yên zêdebûyî yên ji ber aloziyên li pey hev, Şaredariya Gel a Qamişlo erkên xwe yên rojane pêktîne.**

Di nav zehmetiyên xizmetguzariyê û zextên mirovî yên zêde de, Şaredariya Gel a Qamişlo wekî dabînkerê sereke yê xizmetguzariyê derketiye holê, herwiha ji bo parastina berdewamiya xizmetguzariyê û organîzekirina bersiva awarte ji bo kesên koçber dixebite.
Şaredariya Gel a bajarê Qamişlo tevî rewşên awarte yên ku herêma Cezîrê di van demên dawî de têre derbas dibe, tevî zextên aborî û yên têkildarî xizmetguzariyê yên zêde ku rasterast bandor li binesazî û kapasîteya xebitandinê ya saziyên xizmetguzariyê kirine, erkên xwe yên rojane yên xizmetguzariyê pêk tîne. Digel vê yekê, karê şaredariyê nesekiniye, berevajî vê, ew di çarçoveya çavkaniyên xwe yên berdest de, bi planên rêxistinî û bersivên rasterast ên meydanî ji bo dabînkirina hewcedariyên nişteciyan, di nav de kesên koçber jî, berdewam kiriye.

**Xizmetên paqijiyê… karekî rojane û zehmetiyên berdewam**

Paqijiya giştî yek ji mijarên herî girîng e ku Şaredariya Gel a Qamişloyê ji ber bandora wê ya rasterast li ser tenduristiya giştî û xweşikbûna bajêr dide pêş. Di vê çarçoveyê de, beşa paqijiyê ya şaredariyê rojane û bi rêkûpêk wesayîtên xwe yên paqijiyê dixebitîne, nemaze li kolanên sereke û li taxên qerebalix.
Kamyonên çopê rojê sê caran di kolanên sereke re derbas dibin, li gorî bernameyek pêşwext ku ji bo rêxistina berhevkirina çopê û kêmkirina kombûna wê li nişteciyan hatiye belavkirin. Şaredariyê herwiha kampanyayên hişyarkirinê li dar xistiye da ku niştecîyan li ser bernameyên kamyonan û girîngiya danîna çopê di demên diyarkirî de agahdar bike. Lêbelê, tevî van hewldanan, şaredarî bi pirsgirêkên zelal re rû bi rû ye, bi taybetî jî pabendbûna bi demên diyarkirî yên ji bo avêtina bermayiyan, ku dibe sedema kombûna wan li hin cihan piştî derbasbûna wesayîtên paqijiyê û bandorek neyînî li ser rewşa paqijiyê ya bajêr dike, ku asta hewldana li ser erdê nîşan nade.
Herwiha, nedayîna xercên paqijiyê ji aliyê hin niştecihan ve astengiyeke din li pêşiya pêşveçûna vê sektorê çêdike. Ji ber ku şaredarî ji bo dabînkirina lêçûnên sotemeniyê, lênêrîna wesayîtan û mûçeyên karmendan beşek ji van xercan dispêre ser xwe. Şaredarî tekez dike ku ev xerc li gorî xizmetên pêşkêşkirî beşdariyeke Biçûk temsîl dikin, lê ew ji bo misogerkirina berdewamî û baştirkirina van xizmetan girîng in.
Wekî beşek ji hewildanên ji bo baştirkirina xizmetguzariyan di nav stargehan de, atolyeya paqijiyê ya şaredariyê xebata xwe ya 24 saetan didomîne da ku hewcedariyên navendan bicîh bîne û kêmasiyên teknîkî çareser bike. Ev yek sererastkirina astengiyan, parastina xetên avdanê û çareserkirina her pirsgirêkek ku dikare ji bo niştecihan xetereyek tenduristiyê çêbike vedihewîne. Şaredarî tekez dike ku tîmên paqijiyê piştî wergirtina her raporek mudaxele dikin, ji ber xwezaya hesas a rewşê di nav stargehan de û pêwîstiya parastina jîngehek saxlem û ewle, nemaze ji bo zarok û extiyaran.

**Bersiva bilez ji bo krîza koçberiyê**


Digel pêlên koçberiyê yên ku li herêmê belav bûn, Şaredariya Gel a QamIşloyê ji saetên pêşîn ên aloziyê ve bi lez tevgeriya, mezinbûna berpirsiyariya xwe ya mirovî nas kir. Wê komîteyek taybetî û şaneyek krîzê ava kir da ku zû amade bibin û bersivê bidin hewcedariyên rojane yên koçberan.
Şaneya krîzê ji bo hevrêzkirina di navbera beşên cûda yên şaredariyê de xebitî da ku dabînkirina xizmetên bingehîn di nav stargehan de misoger bike û ji bo derbaskirina zehmetiyên ku mirovên bêwar dikarin rastî wan werin, nemaze ji ber hejmara mezin û şert û mercên dijwar yên jiyanê.

**Av… di stargehan de pêşîniyek sereke ye**

Yek ji pirsgirêkên herî girîng ên ku ji hêla şaneya krîzê ve hatî çareser kirin, dabînkirina avê bû, ji ber girîngiya wê ya jiyanî ji bo parastina tenduristiya giştî. Şaredariyê dabînkirina avê ya domdar ji bo stargehan misoger kir, li gorî bernameyek rojane ku hejmara niştecihên her navendê li ber çavan digirt.
Hewldan bi tenê dabînkirina avê sînordar nebûn, Şaredariya Gel ji bo hin stargehan depoyên avê yên nû jî kirî da ku depoya têr peyda bike û pêşî li kêmasiyên bigire. Wekî din, xebat ji bo parastina torên paqijiyê yên di nav navendan de, danîna lûleyên nû û dabînkirina pêdiviyên pêwîst ji bo garantîkirina gihîştina avê ya ewle û pêbawer hate kirin.

**Pirsgirêk û girêdayîbûna bi hevkariya civakî**

Tevî hemû hewldanên ku hatine kirin, Şaredariya Gel a Qamişlo mezinahiya pirsgirêkên ku pê re rû bi rû ye, çi ji aliyê kêmbûna çavkaniyan ve be, çi jî ji aliyê zexta mezin a li ser xizmetguzariyan ve ji ber zêdebûna nifûsê piştî pêla koçberiyê ya dawî ji Reqa û Tebqayê ber bi herêma Cezîrê ve, venaşêre. Lêbelê, şaredarî tekez dike ku serkeftina pêşkêşkirina xizmetguzariyan ne tenê bi saziyan ve girêdayî ye, lê di heman demê de hevkariyek rastîn ji civakê jî hewce dike.
Di vê çarçoveyê de, şaredarî bang li niştecihan dike ku pabendî bernameya avêtina bermayiyan bibin, paqijiya giştî biparêzin û xerca paqijiyê bidin, ji ber ku ev beşek ji berpirsiyariya hevpar e ku beşdarî baştirkirina rewşa giştî ya xizmetguzariyê ya bajêr dibe. Bi van hewildanên berdewam, Şaredariya Gel a Qamişloyê pabendbûna xwe ya bi bicihanîna erkên xizmetguzarî û mirovî, tevî hemû şert û mercan û zehmetiyan, piştrast dike. Armanca wê ya sereke parastina rûmeta mirovan û dabînkirina jîngehek paqij û saxlem ji bo hem niştecihên bajêr û hem jî ji bo koçberên ku li Qamişloyê, dimîne.



**Bîra Civakê**



## Yekîtiya Kurd serkeftinê misoger dike

**Ehmed Hesen**

Di tecrûbeya serhildan û şoreşên cîhanî de her tim hêza civakî ya bi isyan û xwedî refleksa dijberî tûndiya civakî xwe daye pêş, her çend wan serhildanan di nava xwe de gelek şaştiyên stratejîk hewandine jî, lê ji bo sînordarkirina îqtîdarî û kedxwariyê bûne bersivek, ji şoreşa cotmeha 1917’an a Rûsya heta şoreşa Çîn, Cezayîr û heya bihara gelan her tim qêrîna “Na Ji îqtîdar û kedxwariyê re” bilind bûye û zemîneke şoreşan ava kiriye, lê ji ber ku van serhildan û şoreşan valahiyeke bîrdozî û dûrketina ji armancê jiyan kirine, her tim ketine bin xefika sîstema global a kapîtalîzmê û di hemleyên wê de hatine tepisandin, tevî ku hinek mafên jiyanî bi dest dixistin jî, lê di encamê de sîstemeke ji ya din xirabtir ku kirîza konjuktura siyasî û aborî jiyan dikir dihat afirandin, vê yekê jî mîna derketina ji çiravê û ketina nava agir pênase dikir, ango kirîz kûrtir dibûn û serwerî dihat nepixandin, di heman demê de çi şoreşên îslamî yên piştî dawîbûna serdema Hz Mihemed derketin nikarîn xwe ji bin bandora bîrdozîya dewleta netewe rizgar bikin û pêre di nava yekîtiyekê de bûn. Ya ku ez dixwazim destnîşan bikim kakilê îradeya civakî ye, ev îrade dikare di nava xwe de xweseriya jiyanî bike silogana pêngavên xwe. Êrîşên HTŞ’ê yên ku li dijî destkeftîyên Rojava hatin kirin, vê mesacê dide, ji ber ku ew tu carî qîma xwe bi hêza civakî neynin û behsa yekîtîya dewletê dikin, lewma jî piştî Elewî û Durziyan berê xwe dan herêmên kurdan, armanca her sê êrîşan jî yek e, ew jî tepeserkirina îradeya gel û hêza rêxistinbûyîna wê ya xweser û azad e, lê hevgirtina civakî û leşkerî ya gelê Rojava û tecrûbeya wê ya şoreşê dikarîbû vê hevkêşeya dewlet dikare her tiştî bi hêza hesin desteser bike pûç bike û careke din hêza rêxistinbûna gel raxist pêş çavên cîhanê, sekinîna gelê Rojava li rex hêza xwe û ne razana wê di hemû rojên berxwedanê ji bo Hebûn û Rûmetê de tekez kir ku tu hêz û artêş nikarin hêza gel a bi biryar vala derxînin, her tim di çavkaniya berxwedanan de hêza gel divê esas were girtin, çi sîstemên cîhanî yên hêza gelê xwe û baweriya gel bingeh negirtin, dawiya wan têkçûn bû, rêjîma Baasê ji destpêka şerê 2011’an ve bi heman feraseta ku niha HTŞ’ê pê tevdigere meşiya, tevî ku piştgiriyeke mezin ji hêzên derve yên weke Çîn, Rûsya û Îranê digirt jî, lê di hundir de hêza gel neparast û xwe pêre nekir yek niha têkçûna xwe jiyan dike. Di hin rewşan de hêza civakî ji bombeya atomî zêdetir dikare li ber xwe bide û bi ser bikeve, lê weke Rêber Apo dibêje divê destpêkê gel vê hêza xwe nas bike û bike hebûneke ku têk naçe. Tiştê ku li bakur û Rojhilatê Sûriye di pêvajoya “Berxwedana Hebûn û Rûmetê” de qewimî, ev rastî da jiyankirin, gelê Rojava li dijî zîhniyeta cîhadîst a komên bi ser hikûmeta demkî rihê şerê gel ê şoreşgerî derxist pêş û bi wî rihî xwe seferber kir.